JINEOLOJÎ

DÎROKA JINÊ

AMADEYÎ
2

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Jineolojiyê ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê
- Komîteya Fotoşopê
- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, weke pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA YEKEM 7

JIN DI CIVAKA XWEZAYÎ DE..7

PÊWÎSTIYA FÊRBÛNA DÎROKA JINÊ 8

CIVAKA XWEZAYÎ..11

JIYANA CIVAKÎ 17

AFIRÎNERÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ...20

ABORÎ, BIRÊVEBERÎ Û AVANIYA HIŞMENDIYÊ DI NEOLÎTÎKÊ DE 23

ZANIST DI NEOLÎTÎKÊ DE 27

BEŞA DUYEM 31

SERDEMA XWEDAWENDAN 31

ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ Û XWEDAWENDA DAYÎK 32

NASNAMEYA JINÊ YA XWEZAYA CIVAKÎ: XWEDAWENDÎ 36

PARÊZVANA ÛRÛKÊ: ÎNANNA 41

ÇEND XWEDAWENDÊN DIN JI DERYAYA XWEDAWENDAN......44

BEŞA SÊYEM 49

ŞKESTINA YEKEM YA ZAYENDÎ 49

SERWERBÛNA HIŞMENDIYA ZILAMÊ DESTHILATDAR...............50

WINDAKIRINA XWEDAWENDAN..56

XWEDAWENDÊN BERHEMÊN HIZIRA MÊR..................................61

BEŞA ÇAREM 69

ŞKESTINA DUYEM (MEZIN) A ÇANDA ZAYENDÎ.......................69

REŞKIRINA JINÊ YA BI RÊYA OLÊN YEKXWEDAYÎ......................70

PÊŞBIRKA BIÇÛKXISTINA NASNAMEYA JINÊ 75

DAMARÊN BERXWEDÊR LI BERAMBERÎ ŞIKANDINA ZAYENDÎ - 1...78

DAMARÊN BERXWEDÊR LI BERAMBERÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ - 2...85

BEŞA PÊNCEM 91

SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ 91

KÛRBÛNA KOLETIYA JINÊ...92

JIN Û NAMÛS 96

BEŞA ŞEŞEM 101

BERXWEDANA JINÊ DI ÇEND SEDSALÊN DAWÎ DE 101

DAMARÊN BERXWEDÊR 102

ŞOREŞÊN JINÊ 105

ŞOREŞA FRANSAYÊ.. 105

HIZIRÎNA ŞOREŞEKÊ DI ŞÊWAZA JIYANA JINAN DE 110

SERÎRAKIRINA MÊTINGEHA HERÎ KEVIN.................................... 117

BEŞA YEKEM

JIN DI CIVAKA XWEZAYÎ DE

1. PÊWÎSTIYA FÊRBÛNA DÎROKA JINÊ
2. CIVAKA XWEZAYÎ
3. JIYANA CIVAKÎ
4. AFIRÎNERÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ
5. ABORÎ, BIRÊVEBERÎ Û AVANIYA HIŞMENDIYÊ DI NEOLÎTÎKÊ DE
6. ZANIST DI NEOLÎTÎKÊ DE.

WANE 1

PÊWÎSTIYA FÊRBÛNA DÎROKA JINÊ

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdullah Ocalan dibêje: "Mêtingera dîrokê ya herî kevin û ya herî nû, ya ku piranî bêmuçe û herî zêde kêm muçe, jin e. Weke pêdiviya dîroka desthilatdariya zilam, ji jandariyê wêdetir wateyekê rave nake. Yekem qurbana civaka jandariyê pergala jin-dayîkê bû.

Jin, di destpêka beşên civakî yên hatine perçiqandin û bindestkirin de, tê. Gav bi gav kişandina jinê ya ber bi civaka hiyerarşiyê ve, windakirina wê ya hemû taybetiyên xwe, dij şoreşa herî bingehîn a ku hatiye pêkanîn."

Desthilatdariyeke ku 5 hezar sal in heye. Lê beriya wê jî 2 hezar sal, pevçûnên di navbera xwedawendiyê û destilatdariyê de hene. Bi giştî ev 7 hezar sal in, dîrokeke berxwedana jinê heye. Di nava 5 hezar salên desthilatdariyê de, jin yekser di nava berxwedanê de ne. Jixwe ew 5 hezar sal jî, li ser nirxên ku beriya wê hatine avakirin, xwe ava dike.

Dîroka jinê, berî civaka xwezayî dest pê dike, dîroka nivîskî tenê ne bes e. Ji ber ku gelek dane hene ku di civaka xwezayî

de çandeke xwedawendiyê hatiye jiyîn û li derdora jinê civakbûnek pêş ketiye. Di destgirtina dîrokê de, armanc ne sepadina hebûna civaka xwezayî ye. Divê hişmendiyeke wisa bê dîtin ku civaka xwezayî tune be, dê jiyaneke hevsengî di navabera jin û mêr de jî tune be, xwestek ew e ku li ser bingeha azadiyê tiştên nû werin avakirin. Pêwîst nake jî ku mirov pişta xwe bidin daneyên niviskî.
Ger em dixwazin îro û di pêşerojê de azad bijîn, heger duh tiştekî wisa tune ba jî, em dikarin niha ava bikin. Lê divê ji vî milî ve feraseteke azad a dîrokê hebe.

Dema ku em dîroka jinê bigirin dest; divê em nekevin nav daneyên pozîtîvîst yên ku me dişkînin.
Nerîn ne ew e, kê destpêkê agir dîtiye yan jî kê destpêkê goşt xwariye, nerîna bingehîn, ew e ku hevjiyanek û civakeke xwezayî hebû. Ew jî li derdora jinê hatiye hûnandin. Ango serdemeke azad hebû û îro jî em dixwazin azad bijîn. Ji aliyê mezinbûnê ve avakirina jiyanê, ji aliyê şêwaza jiyanê ve jî hilberîn girtin, tiştên nû afirandin, pêşxistina pergala domandina jiyanê girîng e. Ji bo dîroka mirovahiyê wateyeke girîng a van pêşketinan heye. Dema ku em li dîrokê dinerin, em dibînin ku jin li derdora xwe jiyanekê dihûne, hilberînan çêdike, nirxan ava dike, aboriyê bi pêş dixe.

Ango **bêyî jinê**, jiyan nayê avakirin. Tenê ji aliyê biyolojiyê ve nabêjin. Ji olan bigire heya desthilatdaran, ji dewletê bigire heya kesên derveyî dewletê, çima her kes li ser jinê gotûbêjan dike?! Ji ber jin di navenda jiyanê de ye. Desthilatdarî jî vê dizane, ji ber vê yekê komkujiyên pir mezin jî hatine kirin. Tundiya çors û bîrdozî di nava hev de hatiye bikaranîn. Di hizirê civakê de heta asteke girîng baweriya ku dibêje, jin ji jidayîkbûnê ve weke zayenda duyem û xerab e, kolebûna wê, hatiye bicihkirin. Di dema ku ev yek hat kirin de, efsane, ol, felsefe û zanist jî hatin bikaranîn. Her çar dirûvên (formên) ramanê jî, berhemên hizira serdest a zilam bûn. Ji bo vê hişmendiyê bide pejirandin ku di xwezaya jinê de xerabî û lewazî heye, raman afirandin. Dema ku jinê doza mafê xwe kir êrîşên li ser jinê bêtir bûn. Ji ber dizanin ku di vir de wê

serkeftinek çêbibe, berê êrîşên xwe dan jin û zarokan. Ew êrîş li ser jiyan û pêşerojê ne. Ji ber vê sedemê, zanabûna dîroka jinê pir girîng e û nivîsandina dîroka jina azad jî, erkekî jineolojiyê ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çima pêwîstî bi fêrbûna dîroka jinê heye?
2. Çima desthilatdarî pir li ser jinê gotûbêjan dike?
3. Çima êrîş bêtir tên ser zarok û jinan?
4. Gelo jin di roja îro de di koletiyê de dijî? (Bi mamoste û hevalên xwe re nîqaş bike).

WANE 2

CIVAKA XWEZAYÎ

pergala ku civak tê de ji prîmatan qutbûye, jê re **civaka xwezayî** tê gotin. Ev pergala civakî, heta derketina civaka hiyerarşîk didome. Civaka xwezayî, mînaka civakên serdemên paleolîtîk, mezeolîtîk û neolîtîkê ne. Ji civaka xwezayî re **civaka lebatî** jî tê gotin. Dayîka xwedawend û çanda wê, mohra xwe li vê civakê xistiye. Her civakê, awayê vê civakîbûnê jiyan kiriye. Civaka xwezayî, destpêka heyîna mirov e. Ew tuneba, dê mirovahî jî tuneba. Heta niha civaka mirovan, ji sedî 98 jiyana xwe bi vî awayî domandiye.

Mirovahiyê, tenê li Efrîkayê nêzî du milyon sal, li parzemîna Asya û Ewrûpayê jî milyonek sal, bi vê teşeya civakî jiyaye. Yekem teşeya rêxistinî ya civaka xwezayî, klan e. Mirovahiyê, di civaka xwezayî de bi hezarên salan di teşeya klan, qebîle û êlan de jiyaye.

Klan, zayîna civakê ye, hişmendiya yekem e. Binkeya bingehîn a têgehên zanabûn û baweriyê tê de bi pêş ketiye. Civaka paleolîtîkê ya ku bi milyonên salan jiyaye, di teşeya klanê de ye. Di civaka mezeolîtîkê de teşeya klanê firehtir bûye, bi awayekî gihaştî, dewam kiriye. Piştî civaka neolîtîkê, demekê di teşeya klanê de dijî û şûn de bi awayê qebîle û êlan teşe digire. Neolîtîk, qonaxa dawî ya civaka xwezayî ye, awayê wê yê herî sazîbûyî û pêşketî ye.

KILAN DI CIVAKA XWEZAYÎ DE

Klan, yekîtî an jî civatên li derdora jinê yên ku hejmara wan di navbera 20-50 kesî de ne û pir girîng in, ji ber ku awayê hebûna mirov ên destpêkê ne, tê de:

Jin: Bi komkirina pel û giya, **zilam** jî: Bi nêçîrvaniyê ve mijûl dibin. Berhemên tên bidestxistin, ên hemû civakê ne. Ji ber ku klan, ne civakeke aloz e, pirsgirêkeke wê ya diyar tune ye. Klan, civakeke bê takemaf, hiyerarşî, çîn û dagirkerî ye. Jiyankirina wê ya demdirêj, girêdayî hêza rêgeza piştgirî û alîkariyê ye. Têkiliyên serwerî, berjewendî û dijberyê, di vê pêkhatina destpêkê de tune ne.

Di hizira klanê de xweza, dayîka ku di hembêza wê de mezin bûye. Têkiliya bi xwezayê re weke têkiliya dayîk û zarokan e. Endamên klanê, di asta nebe nabe de, bi pîvana jiyana bi endamên klana xwe ve girêdayî ne. Endamekî klanê, nikare ji endamekî din cuda û xwesertir bijî. Jiyana di klanê de, rêgeza bingehîn e. Di klanê de rêzika “an hemû, an qet” bingeh tê girtin. Hebûneke takekesî a ji klanê cuda nikare bê hizirîn.

Awayê herî diyar ê hizirîna klanê, hizira anîmîst û totemîk e.

Anîmîzm, baweriya bi giyan û zindîbûnê ye. Xwezayê, weke xwe zindî dibîne. Li gorî baweriya klanê, xweza tijî zindî û giyan in. Hemû pîroz in, destdayîna wan, dibe ku bi xwe re encamên xerab derxe holê. Divê bi rêzdarî nêzîkî wan bibin.



Girêdayî vê hizira anîmîst, pîresêrî jî di civaka xwezayî de pêş dikeve.

NASNAMEYA KLANÊ: TOTEM

Totem: Raveya nasnameya klanê diyar dike. Klan, piranî heyînên ku hêzê rave dikin, dike totem. Ji ber ku hîna yekîtiyên olî û mezhebî bi tevahî pêk nehatine, xwedayê her klanê heye. Hîna jî navên weke: şêr, baz, mar û gur ên di hin êlan de tên dîtin û navên hin şînatî û darên girîng ji wê demê mane.

Totem, ji lawir, şînatî û heybera di xwezayê de herî pir sûdê dide jiyana klanê, tê hilbijartin û pê tê bawerkirin. Nasnameya klanê ye, weke sembola klanê, pîroz e û kes nikare dest bavêje wê.

Wek Mînak: Çêlek pîroz e, ji ber ku gelek berheman dide civakê û kuştina wê jî sûc e.

Ev jî, vê yekê nîşan dide ku di civaka xwezayî de bawerî û xweza di nava hevgirtinekê de ne. Di baweriya totemê de têkiliya serweriyê tune ye. Totem ne hêmana tirsê ye, hêmana bihêzkirinê ye. Kesayetî û hêzê dide qezenckirin. Klan, ji girêdana bi totemê re hêzê digire û heyîna xwe watedar dike. Civak, rêzdariya li hemberî totemê, di rastiyê de weke rêzdayîna xwe dibîne. Bêyî ku bi awayekî hişk bi pîvanên klanê ve girêdan were çêkirin, jiyan ne gengaz e. Ji ber vê yekê, totemê weke şewqa heyîna civakê ya herî bilind û pîroz dipejirînin. Totem, raveya sembolkirina hizira civakê ye. Ji vî alî ve yekem razberkirina ramanê ye.

RÊGEZÊN BINGEHÎN ÊN CIVAKA KLANÊ

1. Klan, yekîtiyeke ku li derdora jin-dayîkê pêk hatiye.
2. Totem, nasnameya civakê ye, pîroz e û dest lê nayê dayîn.
3. Di hizirîna klanê de her diyarde weke wê zindî ye, ango klan anîmîst e.
4. Klan, xwezayê weke dayîka xwe ya ku di hembêza wê de mezin bûye, dibîne.

CIVAKÎBÛNA LI DERDORA JINÊ

XWEDAWENDA BIBEREKET

Civaka xwezayî, civaka li derdora jinê ye. Diyardeya "dayîktiyê" hêza herî kevin û destpêkê ya civakîbûnê ye. Jina ku zarokan tîne cîhanê, wan xwedî dike, dike komker, parêzvan û ya herî baş dide jiyîn e. Têkilî û parvekirina di navbera dayîk û zarokan de têkiliya civakî ya destpêkê ye.

Jin: taybetiyên xwe yên weke: hilberîn, parastin, domandina jiyanê, fedekarî û hezkirina bêberdêl, di avakirina civakê de, bihêz rêxistin dike û bi kar tîne. Dayîk e ya ku di mercên herî zor de dide jiyîn û diafirîne. Ev, pîvana herî baş a civakîbûnê ye. Ji ber vê yekê, pîrozkirina wê bi pêş dikeve.

Ji rêxistina destpêkê ya civakê, ji klanê bigire heta awayên qebîle û êlan, civakîbûnên ku li derdora jinê careke din pêk hatine, têgehên: "Ddayîk û dayîka xwedawend," diyardeyên herî bingehîn ên civakîbûnê ne.

Di pergala dayîkê ya civaka xwezayî de bingeha çanda aboriyê tê danîn. Xwarinên ku bi rêya komkirin û nêçîrvaniyê tên bidestxistin, di cih de tên mezaxtin. Ji çermê lawiran, ra û rîşikên şînatiyan sûd tê wergirtin.

Jina dayîk, pêşenga sererastkirina klanê ye. Bi wateyeke din, pêşengiya yekem a dayîkan e. Têkilî û nakokiya bingehîn a civata klanê, ji mercên hawîrdor û xwezayê yên metirsîdar tên parastin.

Nasnameya klanê, di van mercan de çawaniyeke jiyanî hildigire nava xwe û jê nagere. Têgeha jin-mêr pêş neketiye. Zarok, tenê dayîkê nas dike. Nayê zanîn ku jin, ji kîjan zilamî ducanî bûye, lê tê zanîn ku zarok, ji kîjan jinê ye.

Ji ber serpêhatiyên xwe yên jiyanê, tiştên ku di civaka xwezayî de pêk tên a ku herî baş dizane, jin e. Jin, hêz û

berdevka civaka xwezayî ye. Di hemû peykerên ku ji vê demê mane de şopa jinê tê dîtin.

Klan, yekîtiyeke ku li derdora jina dayîk pêk hatiye. Di vê demê de piraniya peyvên ku çêbûne, mê ne. Ev jî, belgeyeke din a vê rastiyê ye. Taybetiyên zilam yên fizîkî, neçar dike ku li cihên dûr pey nêçîrê bikeve û klanê ji metirsiyan biparêze.



Ev taybetiyên ne diyarker, aşkere dikin, çima zilam di civak xwezayî de jêçûyî û winda ye. Di nava klanê de têkiliyên taybet pêş neketine. Ne jin, ne jî zilam hîna taybet nebûne. Hîna weke milk, bandora zilam a li ser jinê tune ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Awayê jiyana endamên klanê, çawa ye?
2. Taybetiyên klanê, çi ne?
3. Xweza, di baweriya klanê de çawa ye?
4. Totem çawa tê hilbijartin?
5. Taybetiyên ku jin di klanê de bi kar tînin, çi ne?
6. Gelo di jiyana me ya îro de baweriya bi totem heye? (Lêkolîn û nîqaş bikin).

WANE 3

JIYANA CIVAKÎ



Civakên beriya şaristaniyê, ango civaka xwezayî: Weke şaneya kokê ya heyîna civakê ne. Di civaka neolîtîkê de jî, civakîbûna ku herî kêm bi qasî heft milyon salî bi teşeya klanê jiyaye, qonaxa dawîn ya civakîbûnê ye. Civaka xwezayî, tu carî nikare bê bidawîkirin û tunekirin.

Neolîtîk, qonaxa ku civaka xwezayî lê bi sazî û mayînde bûye. Di serdema neolîtîkê de klanên ku bi sed hezarên salan, civakên serdemên paleolîtîk û mezolîtîkê bûn, cihê xwe ji avaniyên berfirehtir re dihêlin. Civaka nû, bi giranî xwe dispêre jiyana gundan. Girêdanên klanê, vedigerin girêdanên civakê.

Di dema neolîtîkê de hîna diyardeya netewbûnê pêk nehatiye. Lê zayîna civaka qebîleyan pêk tê. Mirov dikare ji civaka neolîtîkê re bêje; civaka hozan jî. Serdema zêrîn a çêbûn û pêşketina êlan, serdema neolîtîkê ye. Şoreşa Yekem; çandinî, kedîkirina lawiran û derbasbûna pergala jiyana gundan, bi pergala êlê re di nava hev de ne. Avaniyên civaka neolîtîkê yên rêxistina taybet, girêdayî wê bi xwe ne, danehevên hişmendî û şênberî pêş xistine. Bandorên wê yên çandî hîn jî didomin.

ÇANDA ELUBEYD:

Di salên 5,700 ê B.Z de li Mezopotamyaya jêrîn (li derdora bajarê Erîdu) çanda Elubeyd dest pê dike, ji çanda Tilhelefê bandor dibe û sûdê digire. Bi çanda Elubeyd re baviksalarî li

pêş dikeve. Pergala zayendî, bi vê çandê dest pê dike, ew jî pergala dijberî çanda dayîkê ye. Hîmên bajar û bajarokan di vê çandê de tên dayîn, di heman demê de, koletiya mirovan di rêya bikaranîna wan di kolandina coyên avê de, dest pê dike.
Ev çand bi çanda jorîn a Mezopotamyaya Aryenî û Tilhelefê re dikeve nava pevçûneke mezin. Bandora xwe li çanda Tilhelefê dike û mêtingehên xwe li wir ava dike. Bermahiyên van mêtingehan heya niha li bajarê Meletî û Elezîzê hene. Pergala xanedaniyê pêş dikeve. Di nava vê pergalê de bi rêya xwînê malbatên mezin, ango xanedanî tên avakirin. Di çanda beriya wê de xanedanî tune bû.

Tevahî vesazî û sazîbûnên ku mora xwe li pêşxistina civakê dane, destpêkê li Kevana Zêrîn, bi taybetî, di dema (6.000-4.000) B.Z de çêbûne. Ev dem, tam dema sazîbûnan e.

AWAYÊ VESAZÎBÛNAN:

Cihê ku hemû avaniyên gund ên ku lê bimînin, hatine diyarkirin. Derbasbûna jiyana xwecihî çêbûye. Perestgehên destpêkê derketine holê, etnîsîteyê heyîn qezenc kiriye. Avaniya wan a ziman zelal bûye, kevineşopiya cîrantiyê pêk hatiye. Di civaka neolîtîkê de koxik bi awayê rêzên rêkûpêk li kolanan tên bicihkirin.



Ev jî, heyîna jiyaneke komî ya ku hatiye pejirandin e û Pergala civakî û heyîna rêxistinbûnê nîşan dide. Birêveberiya bisinc, dema xwe ya herî bihêz saz kiriye. Di wateyekê de mayîndebûn û sazîbûna civaka neolîtîkê, şoreşa çandiniyê û gundan misoger bûye. Civak, di bingeha xwe de xwediya çawaniyeke sincî û ramyarî ye.

Di dema neolîtîkê de çanda jinê digihîje lûtkeyê. Hîna siha zilam jî li ser hevbeşiya civakê tune ye. Nikare hebe jî, ji ber ku awayê jiyana civakê destûrê nade vê yekê. Dema ku civak tê gotin, tê wateya jin-dayîk, zarok û xwişk-birayên wê, bi taybetî, weke zayend jî navê civakî yên zilamê serwer, mêr, xwedîmilk û dewlet çênebûne. Gengaz e, ger berendamê hevjînî be, li derveyî mêrtiya wî, mînak: Ger nêçîrvanek baş be, sûdmendiya xwe ya ji aliyê xwedîkirina lawiran û komkirina berheman ve nîşan dabe, dê were pejirandin. Weke diyarde hîna maf û hesta ku bêje: “Ez mêrê jina xwe, bavê zarokên xwe me” pêş neketiye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Vesazîbûnên destpêkê, li ku derê û kengî çêbûne?

2. Gotina civak, di neolîtîkê de tê çi wateyê?

3. Têgehên ku ji pergala civaka xwezayî mane, çi ne?

4. Çima civaka xwezayî, girîng e?

5. Têgeha desthilatdariyê di civaka xwezayî de nehatiye naskirin. (Komekê ava bikin û bi hev re nîqaş bikin).

WANE 4

AFIRÎNERÊN ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ

Şoreşa neolîtîkê ya ku jê re şoreşa çandinî, gund û zeviyan jî tê gotin, robarê bingehîn ê pêşketina civakê ye ku heta roja me dewam kiriye, bûye çavkaniya dîroka nivîskî, şaristanî û bajarên destpêkê. Gelek destpêkên civaka mirovahiyê, bi vê şoreşê ve hatine pêşxistin.

Birêveberiya dayîkê, şoreşa jin a neolîtîkê ye. Ya herî rast, şoreşa neolîtîkê ya bêhempa, şoreşeke jinê bû. Şoreşeke ku hîn jî mirovahî li ser kevineşopiya wê, debara xwe dike û di hunerê xwe de jî, rê li ber şoreşê vedike.

Piştî dema xêzkirina li ser dîwarên şkeftan, gelek nîgarên dayik-xwedawend tên çêkirin. Ev nîgar, weke destpêka peykertraşiyê jî tê pejirandin. Çavkaniya bingehîn a wêje û muzîkê jî, xwe dispêrin, dema sazîbûna şoreşa neolîtîkê. Muzîka resen girêdayî vê demê ye. Amûrên bav û kalan, bilûra şivan û dahol û zirneyê jî berhemên vê demê ne.

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdullah Ocalan, şoreşa neolîtîkê weha dinirxîne: "Serdema neolîtîkê; li gorî dem û dorfirehiya xwe, dema herî bingehîn a giyan û hişmendiya civakê pêk aniye. Yekem dirûvên hizirînê, bilindbûna giyanî, zanebûn, birêvebirin, zanebûna civakîbûnê û têgehên weke xwegihandina xweda, ango hêmanên bîrdoziyê di vê demê de bi pêş dikevin. Ev dem, di heman demê de ne tenê dergûşa mirovahiya îro, qonaxên zarokatî û ciwaniya mirovahiyê ne jî."

Gordon Childe (Gordin Çêld), Şûnwarnasê bi nav û deng ê Isturaliyayî ye, bi gotina: "Nûvedanên teknîkî yên

civaka neolîtîkê di salên 6.000 - 4.000 B.Z de li kevana Toros-Zagrosê hatine afirandin. Tenê dikarin bi nûvedanên piştî sedsala 16'an ên ku li Ewrûpayê hatine dîtin re were hevrûkirin û nirxê vê şoreşa mezin a dîroka mirovahiyê daye”.

PÎŞESAZIYA NEOLÎTÎKÊ



Bi pîşesaziya neolîtîkê re herî kêm nîvê nûvedanên teknîkî û zanistî yên îro hatine dîtin. Piraniya têgeh û nûvedanên ku em îro bi kar tînin, di vê demê de çêbûne. Ev hemû, bi rewşa xwe ya pêşketî, di roja me ya îro de, di asta dibistana amadeyî ya jiyana civakî de ne.

Weke vedîtinên çandê:



Malên gundan, bicihbûn, çêkirina nan, çandiniya bi zanabûn (tov û fêkî), kedîkirina lawiran, amûrên lawirvaniyê û çêkirina nîgarên xwedawendan, veguhêzî, avahîsazî, tiraşkarî, necarî û hwd.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Berhemên şoreşa neolîtîkê, çi ne?

2. Hin vedîtinên çandê, binivîse?

3. **Bersiva rast hilbijêre:**

   A. Hestên bihêz ên dayîktiyê:
   - a. Nirxên mezolîtîkê ne.
   - b. Nirxên paleolîtîkê ne.
   - c. Nirxên neolîtîkê ne.

   B. Çêkirina nîgarên xwedawendan:
   - a. Ji nirxên neolîtîkê ne.
   - b. Ji vedîtinên çandê ne.
   - c. Ji nirxên bisazîbûnê ne.

WANE 5

ABORÎ, BIRÊVEBERÎ Û AVANIYA HIŞMENDIYÊ DI NEOLÎTÎKÊ DE

ABORÎ DI NEOLÎTÎKÊ DE

Aborî, weke cewher, cara destpêkê xwe dispêre şêwaza danehevê. Derfetên xwetêrkirinê yên ku li derdora jinê pêş dikevin, destpêkirina aboriyê ne. Beşeke mezin amûrên hilberîna şênberî, nûvedanên jinê ne. Xwetêrkirin û çanda cilan, mora jinan hildigirin. Li derdora jinê, malbatên çandiniyê û xwecihiyên destpêkê çêdibin. Derfeta hin cureyên heyberên zadveşartin û xistina embarê, pêşketina aboriyê çêdike. Lê belê ev danehev, ne ji bo bazirganî û bazarê ye, daneheveke ji bo malbatê ye. Ev aboriya rast a mirovî ye.



Di civaka neolîtîkê de nirxê bikaranîna heyberan, derbasdar in. Li şûna guhartinê, çanda diyarîdayînê, awayê aboriyeke girîng e.

Di her palahiyê de xwarina ku têrê bike bidestdixin û têra salekê ji berhemên çêbûne, ji bo siberojê li ser bingeha parastinê, embarkirin‹ hêmaneke sereke ya aboriya neolîtîkê ye. Ji ber vê yekê, embarên dexil an jî depo, taybetiyeke balkêş a her gundê neolîtîkê ye. Aboriya wê, aboriya çandiniya tevlihev a şînatî û xêrûbêra xwedîkirina keriyan bi hev re, çêkirin e.

Her gundêkî neolîtîkê, bû xwediyê aboriyeke ku têra wî bike, dikarin xwarina xwe bi xwe bigihînin. Dikarin amûrên bingehîn ji kevir, hestî, dar û hwd, ên li derdora gund, çêkin. Ji ber ku dilbijîneke şênberî û demeke dirêj bazirganî tune bû

aboriya wê, ji bo xwetêrkirin, tiştên ku pêwîst in, ji bo palahiya pêşerojê bûn, weke tov ji bo hilberîna pêwîst zêdetir bimînin.

BIRÊVEBERÎ DI NEOLÎTÎKÊ DE:

Di pêvajoya civaka neolîtîkê de jina birêveber, nûnera berbiçav a xwedawenda mezin e. Xwedî hêzeke aborî, civakî û baweriya mezin e.

Weke cihên birêveberiyê, di wê demê de ji aliyê jinê ve perestgeh hatine çêkirin û bikaranîn. Birêveberên ku piraniya wan jin in, bi armanca hilberîn, ewlekarî û zêdebûnê bûnê "Dayîk, xwedawenda dayîk" xwediyên taybetiyên ku ji dewletê re girtî ne. Birêveberiya dayîkê ya serdema neolîtîkê, cudahî û koletiyê nas nake. Cewhera pêkhatinên herî ramyarî, sincî, xwezayî û wekhev e. Jin ji ber ku di gelek qadan de zana bû ji ber vê yekê ew bingeh dihat girtin.

AVANIYA HIŞMENDIYÊ DI NEOLÎTÎKÊ DE:

Serdema neolîtîkê; di dema Tilhelef, di navbera salên 6.000-4.000 B.Z de ava bûye. Ev di wateyekê de sazîbûn, rêxistinbûn û hevbeşbûna hişmendiya civakî ye. Qalibên hişmendiya bingehîn a civakê ku wê qet kevin nebe, di vê demê de çêdibe. Tam guhartin û teqîneke hişmendiyê tê jiyîn. Li şûna avaniya zimanê nîşaneyan û hişmendiya klanê, derbasî hişmendiya etnîsîte û gelê gund a firehtir dibin.

Pergala zimanê sembolî, pir bilez pêş dikeve. Di ziman de qonaxên mê derdikevin pêş. Di qonaxên zimanê sembolî de demeke dirêj hêmanên mê rewşa xwe ya serekebûnê diparêzin. Afirînekên şênberî û razberî ku derketine holê, pergala navlêkirineke nû û dirûvên hişmendiyeke nû pêwîst dikin. Civaka nû; tê wateya têgeha nû û navlêkirina nû. Bi hezaran pêkhate; tê wateya bi hezaran şoreş, hişmendî û nav.

TILHELEF

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Hêmana sereke ya aboriya neolîtîkê, çi ye?

2. Birêveberiya dayîkê ya serdema neolîtîkê, çawa ye?

3. Afirînekên şênberî û razberî, çi ne?

4. Çi cudahî di navbera aboriya kevin û ya dema niha de heye? (Nîqaş bikin).

WANE 6

ZANIST DI NEOLÎTÎKÊ DE

Di civaka beriya şaristaniyê de agahî û zanist, parçeyeke civaka sincî û ramyarî bûn. Ger ne ji bo berjewendiyên civakê be, zanist ji bo tu tiştên din nayê bikaranîn.

Armanca agahî û zanistê domandina heyîn, parastin û xwedîkirina civakê ye. Di xwezaya civakî de wateya zanistê, xwedayî ye.

Pratîkên jiyana civakên zevî û gundan a bi hezarê salan berbelav bûye, zanisteke mezin bi pêş xistiye. Agahiya jinan a derbarê şînatiyan, bingeha zindînasî û bijîşkiyê danî ye. Wekî din, ji ber ku jin çavdêriya demsal û mehan dikirin, fêrî hesabkirinê dibûn.

PIRSGIRÊKA EWLEKARIYÊ DI NEOLÎTÎKÊ DE

Di civaka neolîtîkê de hêmanên ku ji hundir ve gefan li jiyana civakê bixwin û civakê bikişînin rewşa pevçûnan, tune ne. Ji ber ku sincê civakê rê nade vê yekê. Hîna dewlet û dadnasî, tune ne. Desthilatdarî, nayê naskirin. Di feraseta dema neolîtîkê de cudabûna kirde û xemsariyeke jidil a li hemberî ekolojiyê tune ye. Bêguman, destpêkeke ku rê ji milkiyetê re veke, hatiye kirin, lê di wateya rast de ev veneguheriye milkiyetê.



Di parvekirina navbera zayendan de têkiliyên zor û milkiyetê cih nagirin. Di bidestxistina xêrûbêran de milkiyeta taybet tune ye. Rêgeza sincî parvekirin û piştgirî ye.

Gelek nîşanên dîrokî,

derdixin holê ku pirsgirêka bingehîn a vê civakê, pirsgirêka ewlekariyê ya ku ji derve tê. Çandiniyê, rê li ber dewlemendiyê vedikir.

Ev dewlemendî, dibe sedem ku li ser cihên xwecihî, êrîşên ji derve bi pêş bikevin. Ji komkirinê, derbasbûna hilberîna çandîniyê, rê li ber berhemên pirtir vekir. Vê yekê jî, bi xwe re di şînatiyan de pirbûn anî. Jiyana xwecihî û gundan, bi xwe re pêşketina çanda zeviyan, rez û bexçeyan bilez kir. Vê rewşê, dem bi dem li ser qadên ku axa wan berhemdar û têr şînatî ne, rê li ber pevçûnan vekiriye.



Êrîş, ne tenê ji aliyê lawiran ve dihatin, ji civakên din û ji zilamê hêzdar ên ku derdikevin pêş jî dihatin. Ji ber pêwîstiya parastina li hemberî van gefan, bi xwe re li derdora gundên ku vediguherin bajaran, avakirina kelh û sûran tîne. Karîbûn xwe ji van êrîşên ku çavkaniya xwe ji derve tînin biparêzin û sînordar bikin.

Lê nikarîbûn xwe ji pêkhateyên çîndarî yên ku ji hundir ve bi pêş diketin, biparêzin. Hêdî hêdî tovên pirsgirêkên civakî yên destpêkê, tên reşandin. Bi vî awayî, şoreşa neolîtîkê ya ku çavkaniya çareya pirsgirêkên civakî bû, bingeha heyberî ya bajar, hiyerarşî û çîndariyê jî afirand. Di dîroka mirovahiyê de bi qasî pêşketinên nû, rê li ber pirsgirêkên nû jî hatiye vekirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Armanca agahî û zanistê, çi ye?
2. Dewlemendiya çandiniyê, çi bi xwe re aniye?
3. Êrîşên li ser neolîtîkê, ji aliyê kê ve dihatin?
4. Gelo em dikarin bibêjin çanda şer, sedema wê pere ye? (Nîqaş bikin).

BEŞA DUYEM

SERDEMA XWEDAWENDAN

1. ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ Û XWEDAWENDA DAYÎK

2. NASNAMEYA JINÊ YA XWEZAYA CIVAKÎ: XWEDAWENDÎ

3. PARÊZVANA ÛRÛKÊ: ÎNANNA

4. ÇEND XWEDAWENDÊN DIN JI DERYAYA XWEDAWENDAN

WANE 1

ŞOREŞA NEOLÎTÎKÊ Û XWEDAWENDA DAYÎK

❋ **Avakirina pîroziyê li derdora jin-dayîkê**, çalakiya neolîtîkê ya herî bingehîn e. Ev pîroziya jinê, baweriya ola totemê ya kevin dixe plana duyem. Weke têgeheke zindî ya ola xwezayî bi dayîka xwedawend re tê nîşankirin. Di pêkhatina civaka nûjen de, rista diyarker a jin-dayîkê ye. Sazûmaniya dayîkan, mora xwe bi her awayî li civaka klanê dide.

DAYÎKÊN XWEDAWEND (TILBÊDER)

❋ **Jin-dayîk**, êdî hem ji aliyê çanda razberî, hem jî ji aliyê çanda şênberî ve, endama sereke ye. Xwedawendî, pîrozî û jiyana hevbeş a li derdora jin-dayîkê, her ku diçe bi pêş dikeve. Di çanda xwedawendiyê de nirxên asîmanî yên weke, roj, heyv û stêrk li jinê tên barkirin. Di zimanê aryenî de peyva **Star**; hem xweda, hem mezinbûna pîroz, hem jî ji ber ku wateya stêrkê dide, vê rastiyê pir baş rave dike.

❋ Jiyan, bidestxistina wateyeke bi sêhr û coş derbas dibû. Jiyan bixwe, serpêhatiyeke ku bi derbasbûnê ve tijî bû. Jiyan, li derdora jina dayîk dihat birêxistinkirin. Ji ber vê yekê, hemû xwedîtiya derbasbûnê yên jin-dayîkê dihat dîtin û gihaştina xwedawendiya jinê jî, di vê çarçoveyê de dihat destgirtin.

❋ Xwedawendî, ne gihaştina bilindbûneke bi darê zorê bû, berovajî vê; bilindbûneke zihnî ku bi pêkanîn û xwedîderketina li jiyanê ve, girêdayî bû. Civaka neolîtîkê; bi

dest, dil û ramana jin-dayîkê pêk dihat, mora wê, bi giştî li ser vedîtinên ku girêdayî lawirvanî û çandiniyê ne jî heye. Çanda jin dayîkê bi hişmendiya zilam nayê şîrovekirin. Ev çand, rastiyeke ku bi hezarên salan hatiye jiyîn.

❋ Ev pêvajoya tê diyarkirin, dibe ku hizirîn û xeyalkirina wê, bi me zor be, ji ber ku qalibên hişmendiyê yên ku bi me dane qezenckirin, ji me re dibin asteng.

Lê her çi qas ev rastî bi me zor be jî, ev tişt rastiyek e, ji beriya deh hezar salî ve bîr û baweriya xwedawendiya dayîktiyê hebû. Tiştê ku ji çanda xwedawendiyê re rê vekiriye, çanda li derdora jinê ye û çanda civakî ya ku bingeha şaristaniyê ava kiriye, çanda kurdan bû. Welatê ku destpêkê xwedawendan text lê danîne, Kurdistan e. Her wiha, erdnîgariya ku destpêkê û herî xurt çanda xwedawendiya dayîkê lê hatiye jiyîn, Kurdistan e.

❋ Kurdistan, zemîna herî xurt a çanda xwedawendiya dayîkê ya bi navê Star, ango Îştar-Înanna ye ku li Rojhilata navîn û cîhanê belav bûye. Civaka ku bêtir bandora çanda gundên neolîtîkê lê hatiye kirin, civaka kurd e. Çanda xwedawendiya dayîkê ya serdema neolîtîkê ya çandiniyê, hîn jî bi awayekî herî xurt di dayîkên kurd de dijî.

❋ Di dema Tilhelefê (6.000 - 4.000) sal B.Z de di civaka neolîtîkê de bingeha zanistê tê avêtin.



Di vê demê de tevkariya xwedawenda jin, diyarker e. Afirînerî, naskirina şînatiyan, çandinî, kedîkirina lawiran, çêkirina kûzik û kincan, tevin û çêkirina malan, tevirkarî û her wiha li benda darê fêkiyan mayîn, hemû di bin çalakîvaniya jinê de pêk tê. Jin-dayîk, di rewşa mamosteyên destpêkê de ne. Xwedawendiya xurt, çavkaniya xwe ji vê civaka birêveberiya dayîkê werdigire.

❋ Di şoreşa neolîtîkê de teşeyên hilberînê yên ku jinê ji kevin ve vedîtibûn, fêrî zilam jî dike. Bi vî awayî, wî bi giştî dikişîne jiyana civakî û aboriyê. Dadnasiya vê demê, dadnasiya dayîkê ye. Çanda di tevahiya civakê de tê pejirandin, çanda ku ji tevahî pêşketinên şaristaniyan re rê vekiriye.

Di sazûmaniya jin-dayîk û rastiya malê de zilam xwediyê pileyeke herî jêçûyî û ne diyar e. Lê jin bi her awayî, diyarker û gelêrî ye. Ji ber vê yekê xal û xaltîk li şûna bav tên destgirtin.

Dibe ku bê bîra me, gelo çima ev pêşketin bi dest û pêşengiya jinê hatiye jiyîn?

Ji ber ku jin, ji aliyê çandiniyê ve pêşeng bû, weke dayîka jiyan û xwedîkirinê dihat dîtin, lawirên ku di pêdiviya jiyanê de bingeh in û neyên xwarin, jinê ew ji xwe re kiribûn totem.

Jinê, li gorî pêdiviyên civakê yên xweser, biryara ku wê çi bibe totem distand. Jin, weke zayendeke zarokanînê, di parastina zarokan de xwediya berpirsiyariyeke kûr e. Jin, weke hêza bingehîn, ajoya destpêkirina civakîbûna mirov vediguherîne hestan. Hezkirina wê ya li hemberî zarokên wê, wê ber bi parastina zarokan ji gerim û sermayê ve dibe. Berpirsiyarî û hişyarbûna xwe, her dem hişyar dihêle û pêş dixe. Ji ber ku zilam, zarokan nayne û li hemberî zarokên çêbûne ne xwedî hesteke taybet û malparêz bû, zarokên xwe nas nedikirin.

Têkiliya zarok û jinê, tovika civakîbûnê ya yekem e. Di pêşketin û parastina vê dendikê de jin berpirsiyar bû. Ev tişt, ji ber pêwîstiya xwezaya xwe dikir. Mijûlbûna wê ya zêde bi berpirsiyariya axê û şînatiyan ve girêdayî, zindînasî û derûniya wê jî, ji kûr ve bandor dikir. Ev pêvajoya mezaxtina kedê ya jinê, di heman demê de ramana wê jî bi pêş dixist.

Têkela hêza raman û hestan, jin afirîner û bedew dikir. Mezinkirin û xwedîkirin, her wiha xwedîkirina zarokan di jinê de veguherandin, dîsiplîn û milê wê yê perwerdekirinê bi pêş

dixist. Para perwerdekirina zarok, enerjiya wê ya bedew û afirîner, di rênîşankirina pêşxistina civakî ya zilam de, ji jinê re dibe alîkar. Jinê destpêkê ev para xwe di kedîkirina lawiran de bi kar aniye.

Weke çavkaniya debara bingehîn a lawiran, bi sûdwergirtina cur bi cur ve girêdayî, ji bo pêşîlêgirtina aliyên wan ên metirsîdar, lêgera xwedîkirina lawiran di jinê de pêş dikeve. Jin, piştî pêvajoyekê axurên ku ji çêlîkên lawiran re çêkiribûn, lasayî dike û bi vê lasayîkirinê re jî malan ava dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di dema Tilhelefê de, tevkariya xwedawenda jin, çi ye?

2. Berhemên jinê yên li gorî belgeyên şûnwarnasiyê, çi ne?

3. Çima dayîk bûne xwedawend? (Lêkolîn bikin).

WANE 2

NASNAMEYA JINÊ YA XWEZAYA CIVAKÎ: XWEDAWENDÎ

TAYBETIYÊN ÇANDA XWEDAWENDIYÊ YÊN HERÎ DIYAR:



Nasnameya jinê ya xwezaya civakî ya sereke, weke xwedawendî hatiye jiyîn. Ev rastî, di belgeyên ku heta roja me hatine û bermahiyên vegotina wê demê dikin de diyar e. Di gelek efsaneyan de hebûna jinê, her tim bi xwedawendên cuda û pir xurt hatine ravekirin. Serdemên xwedawendiyê, bi awayê sê pêvajoyan hatine jiyîn.

❋ **Di pêvajoya yekem de,** xwedawend bi tena serê xwe, di lûtkeya hêza xwe de ye. Ew jî tê wateya ku hêza herî mezin di destê dayîka xwedawend de ye.

❋ **A duyem,** li gel wê, kur-hevjîn-bav û hwd. bi xwedayekî alîkar ê mêr re ye. Hêza xwe, bi wan re parve dike. Li kêleka van tiştan hemûyan, bi têkoşîneke bêhempa karîbû di hevsengiyê de bimîne.

❋ **A sêyem jî,** pêvajoya ku her dem xwedawendî, hêzê winda dike û her ku diçe di çanda civakî de dikeve plana dawî. Ji 2.000 B.Z. ve dest pê dike, heta piştî zayînê berdewam kiriye. Di van 2.000 salan de hêza xwedewandî her ku çûye, kêm bûye.

Di pêvajoyên Nînhûrsag û yên beriya wê de, nasnameya jina dayîk a heye, nasnameya dayîka xwedawend a yekem e. Tê wateya ku ya pêşengiya jiyana civakî dike û tevahî pêwîstiyên wan bi cih tîne, nasnameyên jinê yên xwezayî û azad in.

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdulah Ocalan dibêje: “Di dema paleolîtîkê ya ku hilberîna xwedayîtî tê de bi pêş dikeve, rê û resma olî ya dayîka xwedawend, hizira bereketa ku jiyana mirov vediguherîne, ya rastî pîroz e, dida xuyakirin.

Hunermend, peykerên wê yên weke jineke tazî û ducanî hatiye sêwirandin, ku arkeologan li tevahiya Ewrûpa, Rojhilata Navîn û Nîvgirava Hindê dîtine. Ev Dayîka Mezin, girîngiya xwe ya di hêza xeyalkirina mirov de bi sedsalan berdewam kir…”

TAYBETIYÊN XWEDAWENDÎTIYÊ

1. Xwedawendî, hêzeke civakî ye ku hêza mê û nêr di xwe de dihewîne.
2. Xwedawendî, ne di ser mirov û jiyanê re ye, berevajî vê di nav de û pê re di nava têkiliyê de ye.
3. Afirîneriya wê, her dem jiyana civakî xwedî dike.
4. Têkiliyên xwedî-kole û serweriyê nayên hilberandin.
5. Civakîbûneke wekhev, azad û xwezayî ye.
6. Di navbera xwedawend û mirovan de navbeynkar (sîmsar) tune ne.
7. Her kes digirt nava xwe û li hemberî giştî her dem bendên berpirsiyariyê xurt dikir.
8. Bi çanda jinê ya jiyanê ve girêdayî, hevsengiya di navbera civak û kes de, bi awayê herî guncaw peyda dikir.
9. Afirînerî û hêza wê, pişta xwe didan ahenga xwezayê.
10. Xwedawendî, cihê hezkirin, xweşbînî û dilsoziyê bû.

DAYÎKA XWEDAYAN NÎNHÛRSAG

Di xwedawendiyê de ya rastî di dema navbera 6.000-4.000 B.Z de ku em dikarin jê re bibêjin, dema jina dayîk jî, civakîbûna bi navend jin ku bi hezaran vedîtin pêk anîne, tê pîrozîkirin. Ev xwedawenda Sumerî weke; Nînhûrsag, Babîlî jî weke; Gula Bau bi nav dikin. Xwedawenda dayîk **Star** e ku li Mezopotamyaya Jor, kurd jî wê weke, **Stêrk** bi nav dikin.

Bi sumerî; **Nîn** = nasnava xwedawendê, **hûr** = çiya, gir, **Sag** = parçe, herêm, di vê wateyê de ye. Li gorî Mezopotamyaya Jêr: Çiya, Çiyayê Zagros û Rêzeçiyayên wî ne. Navê Nînhûrsagê; weke belgeyekê ye, ku çanda xwedawendiyê ji çiyayan daketiye.

GELEK TAYBETIYÊN NÎNHÛRSAGÊ HENE:

1. Dayîka xwedayan a ku serdema hilberînê daye destpêkirin, amûran çêdike, di navenda cîhanê de li bihuşta ku dara jiyanê tê de heye, dijî.

2. Weke xwedawendeke dayîk a afirîner nexweşan baş dike û serwerê li çarenûsê dike.

3. Xanima derên kovî yên mîna çol û çiyayan, xwedawendeke darê ku dîtine bi maran re danûstandina wê ya nêz heye.

4. Xanima cih û jiyanê, xwedawenda bereketê, hêza zayîn, saxlemî û nemirinê ye, heşt xwedayên ku mirov ji wan hez bikin aniye, periya çiyayan, efendiya bajarê Keş.

5. Xwedawenda qadên çiyayî yên bakur û rojhilat, bi Enkî re her tim di nava şer û têkiliyê de ye, bi hêrs û nifirên xwe heşt nexweşiyên dijwar dane xweda Enkî û ji bo her nexweşiya wî baş bike, bi mercê ku ew bi xwe xwedawend diyar bike, xwedawendekê biafirîne.

Nînhûrsag, dema ku xwedawenda herêma çiyayên Zagrosê bû, di ser Enkî re bû.

Dema ku em li vegotina efsane Sumerî dinêrin; em dibînin, jina ku nasnameya sereke ya serdema şoreşa çandiniyê ye, di kesayeta Nînhûrsag û paşê Înannayê de, hatiye tunekirin.

HEVSENGIYA JIN Û MÊR

Pêvajoya di navbera salên 4.000-2.000 B.Z de demeke navber, ango demeke ku hêza jin û mêr di hevsengiyekê de ye. Xwedawendên vê serdemê, bi qasî xwedawendên beriya xwe ne di lûtkeya hêza xwe de bin jî, hîna raveya nasnameya jinan diyarker e. Di van pêvajoyan de êdî giftûgoya xwedawendên ku bi tena serê xwe li textên xwe rûdinên, pir nayên dîtin.

ISIS Û OSIRIS

Piştî vê, li gel xwedawendan di statûya hevjîn-bav-kur-bira, yan jî yar de wê xwedayekî mêr ava bibe.

Cotên Afrodît-Adonîs, Îştar-Dûmûzî, Astarte-Baal, Hepat-Hepate, Ceybele-Attîs, Isis-Osiris, mînakên, herî baş tên zanîn. Lê ev guherîn; rastiya ku dayîka xwedawend bi demdirêjî û hêza xwe ya afirîner ve çavkaniya sereke ya jiyanê ye, naguherîne.

Xwedayên mêr, her wiha bi sedsalan, weke rastiyeke “bi sernermiya zarokekî” tenê bi dayîka xwedawend re watedar dibin, dikarin bibin xwedîwate. Hin xwedawendên girîng hene ku di vê dema navber de jiyane.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pêvajoya yekem a serdemên xwedawendiyê jiyan kirine, çi ye?
2. Wateya navê xwedawend Nînhûrsag, çi ye?
3. Cotên xwedawendan ên tên zanîn, kîjan in?
4. Xwedawendî têkiliya hevsengiya di navbera mirov û jiyanê de ye û mezintir nabe. (Nîqaş bikin)

WANE 3

PARÊZVANA ÛRÛKÊ: ÎNANNA

Di vê demê de navê sembol a herî xuya dike, Înanna ye. Di efsaneya sumeran de, di salên 3.000’î B.Z de xwedawenda yekem a Sumer Înanna, weke peyhatiya Star a ku xwedawenda çiyayan a beriya wê ye, derdikeve ser dika dîrokê.

Sumeran, ew weke xwedawenda parêzvan a Ûrûkê dipejirandin. Înanna, di heman demê de xwedawenda; eşq, xwedawenda şer a destpêkê bivir hilgirtiye, rênîşanera hevjîniyê, sembola firehî û bereketê, xweşikî, balkêşî, hêz, zanyarî, dilovanî, şaşîtiyan siza dike, nexweşî û xerabiyan tune dike, mirinê dide. Di dîwana xwedayan de cih û rewşa Înanna, ji yê mêr ne jêrtir e.

Di dema sumeran a hevsengiyê de xwedawend Nanşe hebû ku erka wê: salê carekê ji ber tevgerên baş û xerab, mirovan bidarizîne û siza li wan bibire.

Ji bilî van jî, li ba sumeran, xwedawendên cuda hebûn weke:

1. **Nammu:** Ya ku navê xwe ji avakirina gerdûnê distîne.

2. **Bau:** Xwedawenda tenduristiyê ye.

3. **Nînmûk:** Parêzvana sifirê ye.

4. **Nîdaba:** Parêzvana nivîsê ye.

5. **Nînkasî:** Parêzvana vexwarekên meyê ye.

6. **Ûttu:** Parêzvana raçandinê (rêsînê) ye.

7. **Kîndaz** :Prêzvana berberan e .

XWEDAWENDA ŞER Û EŞQÊ: ÎŞTAR

Yek ji nasnameyên jin yên vê serdemê ye ku di efsaneyên akadan de derbas dibe, xwedawend **Îştar** e û bi navê **Înanna** jî tê naskirin.
Ev xwedawend, li cem aşûr û babilan xwedawenda herî delal e. Îştar, di bingehê de xwedawendeke neolîtîkê ya çiya û çandiniyê ye.
Weke **Îştar**, **Stêrk**, **Star** jî tê zanîn. Xwedawenda şer û eşqê ye, ku wê bilind dikin asîman.

ÎŞTAR

HIN NAV Û TAYBETIYÊN ÎŞTAR YÊN TÊN ZANÎN:

Keybanûya xwedayan, xwedawenda bereketê, xwedaya hêza zayendiyê ye. Ev gotin, di 2.000 B.Z de, li Babilê li ser kevalekê (tabletekê) ji bo Îştarê hatine gotin.

Wateya xwedawendiyê ya di jiyana civakî de pir zelal rave dikin. “Xwedawend! Cihê biryarê kêleka wê ye, çarenûsa her tiştî di destên xwe de digire. Kêf, coşa jiyanê, hişmet û hêza afirîner a di jin û mêr de ji awirên wê çêbûne.”

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di efsaneyên sumeran de Înanna çawa dihat naskirin?
2. Erka xwedawend Nanşe çi ye?
3. Taybetiyên xwedawend Îştar, çi ne?

WANE 4

JI DERYAYA XWEDAWENDAN ÇEND XWEDAWENDÊN DIN

ŞAWÛŞKA (SHAUSHKA):

Li gel hûriyan, xwedawenda şer e ku bi bivir, an jî bi rimê dihat sêwirandin. Her wiha, Xwedawenda Kevin a Îran û medan e, Xwedawenda sereke ya dema baweriya Zerdeşt **Ardvî Sura, Anahîta** ye.

SHAUSHKA

SARASVATÎ (SARASWATI):

Li Hindistanê, Xwedawenda ku hevjîna Xweda Brahma ku giyan û cewhera gerdûnê ye. Xwedawendeke gol û avan e. Di heman demê de bi muzîkê re têkildar û zanyar e.

SARASWATI

GULA BAU:

Li gel kurd û aşûriyan, xwedawenda saxlemiyê bû û weke xwedawenda mirin û jinû ve zayînê, dihat pejirandin.

GULA BAU

KÎBELE (CEYBELE):

Bi taybet, li Anatoliyaya Navîn û Deryaya Spî xwedawenda bereket û zayînê ye, xwedawenda sereke, xwedawenda dayîk, cazîbedar (kişîner), keybanûya lawiran e, xwedawenda şer û aştiyê ye, sembola çawaniya gerdûnî ya xweza, tevahî zindîbûn û bereketê ye…

CEYBELE

HATHOR YAN HWTHR (Tê wateya hembêza dayîka Horis)

Tê hizirîn ku ji xwedawendên herî kevin ên Misirê ye. Hathor, sembola eşq, xweşikî, şerab, muzîk, zayend, çola şer û hêzê ye. Di heman demê de parêzvana heremên çolê ye. Xanima mezin a bajarê **Dendera** (Li Misrê, yek ji nav perestgehên herî navdar e), çavên Ra (tê wateya eyn Horis, di demên berê de navê wê çavê heyvê yan jî çavê ra ye), li ser tevahiya welat digere, ewlehiyê digire, alîkara Ra ye.

HATHOR

SEMBOLA ÇAVÊ RA

ÎSÎS (ISIS):

Xwedawenda herî mezin a Misirê ye. Tê gotin hîna tu tişt nehatibû afirandin jî, hebû. Isis, hem afirîner, hem xwîşk, hem hevjîna xwedayê mêr Osiris bû. Hem dayîktiya sembol û segvana saziya malbatê bû. Efendiya gotinên xwedayî bû. Bi serwera hêzên xwezayê wan bi rê ve dibe, efendiya berhemên şîn û sembola asîman…



ÎSÎS

TIYAMAT (TIAMAT):

Tiyamat bi navekî din dayîka Xubur û weke xwedawenda jiyanê tê naskirin.

Destpêkê xwedayên zilam dibêjin: Em di serî de êrîşî wê bikin, hemû hêz û tiştên di destên wê de jê bistînin, da ku bi bin bikeve ji ber ku hêza wê pir xurt e. Êrîş dikin lê nikarin bi ser bikevin. Piştre dihizirin û diçin cem Mardok. Dibêjin: Em alîkariyê ji te dixwazin, da ku tu Tiyamat bikujî, ji ber ku me çend caran êrîşî wê kir, lê hêza me têrê nekiriye. Wê demê Mardok vî tiştî bi mercê ku 50 xweda navê xwe bidin wî dipejirîne. Mardok bi xwe tenê xwedayê rojê û bahozê ye. Lê belê dixwaze navê xwedayên din jî jêre bê dayîn. Herwiha vî

mercî jî ji wan daxwaz dike, dibêje ku divê gotina dawî ya min be. Ew jî vê daxwaza Mardok dipejirînin û bi vî awayî Mardok diçe Tiyamat dikuje. Dema ku tê kuştin serê wê dibe ezman bedena wê dibe erd rondikên çavên wê jî dibin çemên Dicle û Firatê.

Di vê çîrokê de Tiyamat weke marekî mezin hatiye ziman. Weke wê hinek çîrokên cuda jî hene. Di van çîrokan de jin weke marekî hatiye ravekirin. Mar her tim sembola xwedawendan bû. Çawa ku îro kesên berxwedêr tên reşkirin di van çîrokan de jî jin wisa hatiye reşkirin. Lê belê heya niha jî di nava civakên me de wêneyên Şahmaranê hene. Dibe ku Tiyamat û Şahmaran heman xwedawend bin ji ber ku çîroka wan mîna hev e, lewma hîn jî bawerî bi wan xwedawendan heye.

GIRÎNGIYA NASNAMEYA XWEDAWENDIYÊ

Nînhûrsag, Înanna, Îştar, Tiyamat, Gula, Ceybele, Îsîs, Hathor, Demeter, Afrodît, Astarte, Anahîta, Afrakete, Yemanja, Oyo, Mawulîsa, Olokun, Eluzza, Arîna, Hepat, Bendîs, Sarasvatî, Kalî, Tara, Kwan, Yînher yek ji rastiya azadî û xweşikiya jinê, didin der. Pergala gerdûnê, hêzên xwezayê, zêdebûn û hilberînê, zayîn, mirin, jin û vezayînê bi bedena xwe venêrîn dikin. Navên li xwedawendan tên kirin, her yek taybetiyên jiyan, gerdûn û xwezaya civakî û çawaniyên têkiliya danûstandinê ya di navbera wan de digire. Kûrahî û kokbûna têkiliya jiyan, civak û jinê nîşan dide.

Di lêger û hewldana pênaseya hebûna jinê de nasnameya xwedawendiyê girîng e. Ji ber ku çanda xwedawendiyê demên dirêj, teşe daye hebûn û nasnameya jinê bûye teşeya hebûna jinê ya ku herî pir tê dîtin û heta îro jî ji bîra civakê derneketiye.

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdulah Ocalan dibêje: “Xwedawendî, bingeha tevahiya raveya taybetiyên jinê ye, ku şoreşa neolîtîkê bi ser xistiye. Zanyariya bingehîn a

mirovahiyê di kûrahiyên neolîtîkê de veşartî ye, ji wê derê derketiye û pêş ketiye… Herêma derketina çanda dayîk û xwedawendiyê ya herî bingehîn e.”

Nasnameya xwedawendiyê ya wan serdeman, cihê civakî yê jinê, xwe û civaka xwe, jinan çawa parastiye, zaye, xwedî kiriye, sembola ber û berhemdariyê, hêza jinê vedibêje.

Destpêka saxlem a dîroka jinbûnê, nasnameya xwedawendiyê ye. Ji ber vê yekê jî, mejiyê mêr ê deshilatdar xwestiye vê nasnemeya jinê bide jibîrkirin û haşatîkirin. Girîng e ev rastî derkeve holê û mirov zanibe serdema xwedawendan, ne efsaneyek e. Di pêşketina ber bi hebûn û nasnameya jina azad ve çavkaniyeke herî girîng e. Di serdema xwedawendan de azadî, berxwedan, dilşewatî (trajedî) û keda afirîner heye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Taybetiyên xwedawend Îsîs, çi ne?

2. Çima hebûn û nasnameya xwedawendiya jinê, girîng e?

3. Çima xwedawend Hathor li Misrê ya herî hatiye belavkirin?

BEŞA SÊYEM

ŞKANDINA ZAYENDÎ YA YEKEM

1- **SERWERBÛNA AQILÊ DAHÛRÎNÎ YÊ MÊR**

2- **WINDAKIRINA XWEDAWENDAN: ŞKANDINA ZAYENDÎ YA YEKEM**

3- **XWEDAWENDÊN BERHEMÊN HIZIRÊ MÊR**

WANE 1

SERWERBÛNA HIŞMENDIYA ZILAMÊ DESTHILATDAR



Xebata derbaskirin û xitimîna civaka neolîtîkê çawa û kîjan demê hatiye jiyîn?

Zilam, lawaziya xwe derbas kiriye û hatiye rewşa nêçîrvanekî serkeftî û dibe ku bi yên derdora xwe re cihekî bihêz girtibe.

Çanda nêçîrê her ku çûye, zilam serwertir kiriye. Sînordar be jî, berheman pir kom dike. Dibe ku ev gef li pergala jin-dayîkê xwaribe. Şînatiyên baş û xwedîkirina lawiran jî, dibe ku rê li ber vê hêzê vekiribe. Baviksalarî, di pêvajoyeke ku ji vê demê bipêşdetir bi pêş dikeve.



Di destpêkê de pergala dayîkê, li pêştir e. Bi hiyerarşiya ku pir dibe dema baviksalariyê dest pê dike. Êdî bi ezmûn û pêşketinên hişmendiyê re berhem pirtir dibin. Zilamê nêçîrvan ê ku di kemînê de disekine, bazirganiya berhemên pir dixe serê xwe û di çanda xwe de bi cih dike.

BAZIRGANÎ



Daneheva berhemên cuda yên ku di herêmên cudatir de pir dibe, pêkhateya ku jê re dibêjin bazirgan, dixe dewreyê. Dema ku berhem, pêwîstiyan weke hevbeşiyeke baştir çare bike, an jî weke karbeşiya civakî ya mezin a duyem, bazirganî û bazirgan çêdibin.

Di destpêkê de ramanek hebe jî, ev rewa dibe. Karbeşiyên berhemên ku tên kirin, bazirganiyê bi pêş dixe. Ev jî, jiyan û hilberîneke berhemdar gengaz dike. Ji aliyekî ve zad û raçandin, ji aliyê din ve dema ku cihên metal pir dibin, bazirganî watedar dibe. Bazirganî, ji 4.000 B.Z ve belav bûye. Mêtîngehbûneke (kolonîbûneke) bazirganî bi pêş dikeve û bi vî awayî, deriyê destpêkê yê nijadiyê tê vekirin. Li beramberî berhemên raçandî, dîzik û xilik, bi tiştên piranî metal û kerest re tên veguhartin.

Bi bazirganî û bazirganan re bazar jî teşe digire. Navendên kevin ên ku diyarî û qurban lê tên pêşkêşkirin, hêdî hêdî vediguherin bazarê.

LÊNERÎNÊN DÎROKÎ

Lênerînên dîrokî, di pêşketina desthilatdariya girêdayî pergala hiyerarşî û dewletê de, nîşan dide ku zilam rista pêşengiyê dilîze. Ji ber vê yekê, şkestina serweriya jin a ta dawiya pêvajoya civaka neolîtîkê, diviyabû were derbaskirin. Di vê mijarê de lênerînên dîrokî dide rastkirin ku têkoşînên mezin ên cur bi cur û dem dirêj hatine dayîn.

Baviksalarî, şaristanî û nûjenî bi şoreşa dijber re civaka xwezayî bi paş ve dibe. Koletî û kedxwariya herî kûr a jinê diafirîne û li hemû civakê berbelav dike. Hemû nirxên ku neolîtîkê afirandibûn, bi şaristaniyê re hat haşatîkirin. Di bin serweriya zilam de veguherandina amûrên bisûd û tundiyê.

SERWERIYA ZILAM

Zilamê xurt ê ku bi nêçîrê ve bûye xwediyê hêzê, li dora xwe komekê birêxistin dike û piştî ku vê hêza xwe nas dike û dide pejirandin, berê xwe dide pergala malbatê ya jin-dayîkê û hêdî hêdî dixe bin serweriya xwe. Ev pêvajo, heta damezirandina yekem dewletên sîteyê dewam dike. Pêşî, bi bilindbûna bajarê Ûrûkê re ji salên 3.000 B.Z û pê ve dest bi avakirina şaristaniya navendî hatiye kirin.

Di dîrokê de yekem dewletên sîteyê li Mezopotamyaya Jêrîn ava dibin. Mînaka herî berbiçav, sîteya Ûrûk e. Dikare were gotin; şoreşa herî mezin a dîrokê, li derdora çanda vê sîteyê pêk hatiye.

Her çi qas ev pêşketinên hundir hebin jî, civaka neolîtîkê ji ber çavkaniyên derve ve hat pişaftin. Ev bandora derve, civaka dewleta pîroz a rahîb e. Civaka nû ya ku li derdora mezinbûna berhemên pir, bû bajarî û bi şêwazê dewletê hatiye birêxistinkirin. Piranî bi hêza zilam re cih û rewşeke pir cuda wergirt. Nifşekî bajêr çêbû. Zilamê bihêz û qurnaz, çavkaniya daneheva bingehîn a vê carê, di derfetên bazirganiya berhemên pir ku ji bajêr dimîn de dît. Dengê xwedawendan her ku diçe kêm dibe, dengê jinan bêbandor dibe. Êdî dengê zilamê qurnaz û bihêz jî bilind bû. Ta keviyên çiyayan, herikîna çandeke berovajî dest pê kir.

PÊVAJOYA NÛ

Pêvajoya ku erdnîgariya neolîtîkê, ji aliyê bajêr ve dihat daqurtandin. Bajarbûnên pir, tê wateya sermiyanbûnê. Ev jî, bazirganiyê bi xwe re tîne. Bazirganî jî, bi teşeya mêtingehî dikeve nava damarên civaka neolîtîkê, her ku diçe sermiyandarî, nirxê guherîn û milkiyetê belav dike û lez da berbelavbûna vê civakê. Mîtingehên Ûrûk, Ûr û Erîdo, vê rastiyê aşkere tekez dikin.



ŞANIŞIYA ASÛR

Tu şaristanî, ne resen e. Hemû jî nirxên civaka neolîtîkê bi yekdestiya bazirganiyê re talan kirine û li ser berhevkirinê hatine avakirin. Nirxên neolîtîkê, hatine guherandin û sentezên nû hatine afirandin. Divê neyê jibîrkirin ku weke yekem dewleta rahîb a sumeran, li ser bingeha mendelkirina (tune hesibandina) civaka neolîtîkê hatiye damezirandin. Destana ku şerê Înanna û Enkî ya ku ji bo 104 Me'yan (zagonên xwezayî yên jinê) vedibêje, mînaka herî sereke ya vê mijarê ye. Dîroka nivîskî, bi Sumer re dest pê dike.

PARÇEYEKE JI PERESTGEHA KARAYNDAŞ JI ÛRÛKÊ

ZÎGORATÊN ÛR

Lê bi giştî, teknîka hilberînê û avanîsaziyên jor, ji civaka neolîtîkê derbasî Sumerê bûye. Di roja me ya îro de gelek tişt, vê rastiyê piştrast dikin. Ji xwe, gav bi gav berbelavbûna Sumeran a ji Mezopotamyaya Jorîn ber bi Mezopotamyaya Jêrîn ve bi her awayî hatiye nîşankirin. Dahûrandina civaka neolîtîkê, bi qasî dîroka kurdan, ji bo dîroka hemû mirovahiyê jî gelekî girîng e. Heman wate, ji bo dîroka jinê jî derbasdar e.

Di navbera dîlketina jinê û çanda civaka şerker de têkiliyeke nêz heye. Li derve hiştina jinê û rêzgirtin ji bo desthilatdariya mêrê şerker, bi hev re bi pêş ketine. Piştî ku di civakê de aqilê dahûrandinê yê mêr serwer dibe, di afirandinê de paşketineke kûr tê dîtin. Di navbera salên 6.000-4.000 B.Z de ku serdema jin-dayîkê ye, gelek vedîtinên wê demê hene. Lê ji salên 2.000'î B.Z ve bi hejmareke kêm vedîtin hene.

ENCAMÊN SERWERIYA ZILAMÊ DESTHILATDAR

1. Çanda şer û desthilatdariyê, têra xwe berbelav dibe.
2. Dagirkerî, weke pîşeyeke mezin, pîşeya qralan tê pejirandin.
3. Saziya dewletê, weke vedîtineke mê watedar dibe.
4. Şerên bi armanca talan û gelîheyê (xenîmetê) jî, dibin weke şêwaza debar û hilberînê.
5. Çanda tundiyê ya ku daweriviye hinavê civakê jî, xwe bi şeran xwedî dike.
6. Çanda serweriyê pêş dikeve.
7. Kesayetên herî mezin, bi xwînrijandinên xwe re serbilind in ya ku weke dilpakiyekê tê zanîn.
8. Çavkaniya terora dewletê û çanda tundiya civakî ya di roja me ya îro de ava dibin.



PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Bi çi awayî jin ket bin serweriya zilam?

2. Sereweriya zilam çi bi xwe re anî?

3. Derbasbûna çanda tundiyê di civakî de tê çi wateyê? (Nîqaş bikin).

WANE 2

WINDAKIRINA XWEDAWENDAN

Derbirîna xwe ya herî aşkere di efsaneyê de dike. Agahî tune ye ku weke nav jî, hemû hizirîn di salên 2.000' î B.Z de derketine holê. Ev yek, ji çanda hevpar û kûr a di bingeha wan de ye. Bi teşe kirine sembol (aboriya malê ya jina dayîk, êdî ji aliyê mêrê zordar û fêlbaz ve hatiye desteserkirin), çanda mêrê serwer xwedayî dikin.

Dayîka xwedawend a sereke ya ku bi aryenî navê wê Star, bi sumerî Înanna, bi hîtîtî Ceybele, bi semîtîkî Îştar, bi hindî Kalî ye, her ku diçe navê wan vedimirin û xwedayên mêr ên navborî mezin dibin. Di salên 2.000' î B.Z de kengî jin di warê civakî de kişandin jêrzemînê; têkçûn û piçûkxistina wê jî di warê çand û ziman de xwe da der.

Di çanda şênberî û razberî ya şaristaniyê de ji koletiya mêr û qebîleyan pêştir, weke zayend koletiya jinê tê. Ya rastî, weke koletiya li jêrezemîna civakê, koletiyeke hûrûkûr li ser jinê hatiye sepandin û neçarî rewşeke têkçûyî, piçûkxistî, bêhinlêçikandî û mirdariyê hatiye kirin.

ŞKENANDINA ZAYENDÎ YA YEKEM

Mînaka sereke ya vê mijarê, di destana Enuma Elis de tê vegotin. Li gorî vê destanê, di 2.000 B.Z de Tiyamat, ji aliyê kurê xwe Mardux ve tê kuştin. Bi mirina Tiyamatê re serdema xwedawendan a ku bi têkoşînên mezin di hevsengiyê de mane, bi dawî dibe. Gav bi gav pêvajoya ku xwedayên mêr

DESTANA ENUMA ELIS

bi tena serê xwe li textê xwedawendiyê ya dayîkê rûdinên, bi pêş dikeve.

Êdî mirov, xwedawendê bi tena serê xwe nabîne. Ew êdî weke endameke perestgeha mezin (panteonan) li cem gelek xwedayên ku perestinê ji wan re dikin, cih digire. Lê ji aliyê hêz, xweşikahî, nav û wateya xwe ve hatiye kevinkirin.

Li hemberî hewldanên sazkirina desthilatdariya yekperestî ya xwedayên mêr, **jin gelekî li ber xwe didin**. Ev pêvajo, ji 2.000 ê B.Z heta zayînê; 2.000 sal didome. Demên ku bi desthilatdariya mêr re di nava têkoşînekê de ye û dawiyê jî bi kuştinê, yan jî ji hêz û nasnameya xwe tê dûrxistin, têk diçe.

Piştî vê, serberjêrçûyîna jinê dest pê dike. Xwedawendiya wê, ji destê wê tê girtin. Bi berevajîkirineke mezin re afirîneriya wê, bi hilberînên efsaneyî ve didin zilam. Pergalên nû yên deshilatdariya serdestiya zilam, dest bi sazîkirina hêza desthilatdarî û serweriya li ser civak û xwezayê dikin. Dema ku vî tiştî dikin, pişta xwe didin xwedayê razber û asîmanî. Xwedawendên jin jî, di plana duyem û sêyem de digirin dest. Ev çanda ku ji 2.000 ê B.Z û bi vir de berbelav bûye, di heman demê de çandeke der barê jina dayîk û dayîka xwedawend de, reşkirineke tirsnak û şermok e jî. Her dem efsaneyên ku jin: Ne dilpak, ne kêrhatî û metirsîdar e, bi pêş dixin.

Derbarê rewşa jinê ya civakî, guhertinên pir mezin pêk tînin. Civaka baviksalariyê, êdî di wê hêza ku karibe serweriya xwe bike "destane" de ye. Tiştên ku peywendiya wan bi zilam re hene, tên bilindkirin û weke cangorîtiyê lê dinêrin. Lê çi tiştê ku bi jinê re peywendîdar e, tê biçûkirin. Bi şermezarkirinê ve tê binirxkirin. Desthilatdariya pir hişk a baviksalariyê, bi sembolkirina xwedayên mêr ên cuda re, wê jinê bavêjin derveyî jiyan û hemû qadên civakê. Ev pêvajo, di teşegirtina hebûna jinê de şopên kûr dihêle.

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdulah Ocalan, vê pêvajoyê wisa bi nav dike: "Di dîrokê de cara yekem di warê

zayendî de şkestinek bi vî awayî, dibe ku bandoreke mezin li civakê bike."

Em ji bo vê guhartina di warê jinê de ya li Rojhilata Navîn, dikarin bêjin; **yekem şkestina mezin a zayendî** ya dij şoreşê. Em dibêjin, li dij şoreşê ye, Ji ber ku, bandoreke erênî ji bo pêşketinê, li civakê nake. Berovajî, serweriya hişk û tund a baviksalariyê li ser civakê disepîne, jinê li derve dihêle û jiyan xizan dimîne. Li şûna civaka cotedeng, rê li ber civaka kes a mêran vekiriye. Li Rojhilata Navîn, bi vê şkestinê re dibe ku di warê serberjêrçûyînê de gava yekem tê avêtin. Encamên wê, her ku çûye xerab û tarîtir bûne.

Êdî civakeke yekalî ya bi çanda mêraniyê pêk tê. Mejiyê jinê yê hisî ku demekê derhozî diafirandin û heta dawiyê mirovî û geş bû, winda dibe û li şûna wê mejiyê dahûranê yê ku radestî hişkebaweriyê (dogmatîzmê) bûye, ji xwezayê qut bûye, şer weke tiştekî baş (fazîletekê) dibîne, ji xwîn rijandinê kêfxweş dibe, her awayê kêfî, pêkanîna wê li ser mêrê kole û jinê maf dibîne, cih digire. Ev hişmendî, berovajî mejiyê jinê ye. Ji ber ku di navenda mejiyê jinê de xwezaya zindî û hilberîneke mirovî heye.

PIŞTÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ YA YEKEM

Piştî **yekemîn şkandina mezin a zayendî** pergala mêr a desthilatdar, xwestiye nasnameya jinê bi biryardarî daxînin xweşikbûna wan a fizîkî, dayîktî û zayendiyê kêm bikin.

Lê her wiha jî ev xwedawend, di jiyana civakî de bandorker bûne, hatine hezkirin û perestin ji wan re hatiye kirin. Merlin Stone (Merlîn Stûn) nivîskareke Emrîkayî ye, dibeje: “Ji salên nêzî 500 B.Z ta imperatoriyên Roma, Bîzans û hwd, Perestgehên dawî yên xwedawendan girtin jî, ev perestin bi tevahî nehatibûn çewisandin.” Xwedawenda dayîk a li lûtkeya hêza bîra civakî, bi hezkirina vê xwedawendê ve hewl da xwedî derkeve. Di serî de jinan û piştre jî gelan, piştî xwedawenda jin a ku efsane û olên ku pişta xwe didan zilaman, her dem biguman pêşwazî kirin.

Bi hêsanî, dest ji baweriya jina dayîk û xwedawenda dayîk bernedane. Piştevaniya çavkaniyên xwe yên bawerî û olî yên civaka neolîtîkê û baweriya xwedawenda dayîkê berdewam kirine. Ola xwedawenda dayîk a civaka neolîtîkê, şêweyên baweriyên razdar (mîstîk) ên piştî xwe ji kûr ve bandor kiriye. Xwedawendî, jin, jiyan, xweza, dostaniya mirov-xwedê û hêza derbirîna taybetiyên xwedê yên aştîxwaz, her dem di hizirên xwe de zindî hiştine.

Lê ji **yekem şkestina mezin a zayendî** û şûn de xwedawendên ku derketine, êdî endamên perestgehê ne. Ev perestgeh, piranî ji zilaman pêk tê. Biryarên bingehîn ji aliyê xwedayekî serdar ê zilam ve tên standin. Xwedawend jî, li gorî peywendî û gotûbêja bi vî xwedayê serdar re tên pênasekirin. Hin ji van, ji bo ku taybetiyên xurt ên van xwedawendan biparêzin, li ber xwe didin.

HIN MÎNAK JI EFSANEYÊN YÛNANISTANÊ:

1. DEMETER

Demeter, di efsaneya Yûnanistanî de xwedawenda çandinî, bereket, demsal û hezkirina dayîkê, keybanûya keziyên wê xweşik, çandiniya axê bi mirovan daye hînkirin.



DEMETER

2. AFRODÎT

Afrodît, xwedawenda eşq û xweşikbûnê ya ku ji kefa avê çêbûye. Weke xwedawenda lawirên kovî, li erd, asîman û deryayê, serweriyê dike. Li her dera ku lê gavê davêje, li ser rêyên wê kulîlk

AFRODÎT

vedibin, sedema yekem a bereketa şînatiyan jî tê binavkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Jin, rastî koletiyeke çawa hatiye kirin?

2. Çanda mêraniyê, çawa pêk hatiye?

3. Taybetiyên xwedawend Afrodît çi ne?

WANE 3

XWEDAWENDÊN BERHEMÊN HIZIRÊ MÊR

ATHENA

Bi destên efsaneyê, vê carê jî, xwedawendên ku berhemên hizirê mêr in, tên afirandin. Her ku hizirê mêr ê serdest bi pêş dikeve û bisazî dibe, dixwazin gav bi gav nasnameya xwedawendê ya ku hemû taybetiyên civakî û jiyanî di kesayeta xwe de digihînin hev, bi gelek efsaneyên weke wan re tune bikin. Hemû nirx û taybetiyên xwedawenda dayîk, tên parçekirin. Hemû taybetiyên wê, li xwedawendên cuda tên belavkirin. Êdî nasnameyên xwedawendên ku hemû desthilatdariya civakî di xwe de dihewîne, di dayîka xwedayan de, tune ye. Di jiyanê de wateya vê, hebûna jinê êdî hatiye parçekirin. Nasnameya jinê ya bitevahî, bibawerî, wêrekî, xweşikî, têkoşerî û hebûna danûstandinê ya ku jin hildigirin, hatiye hilweşandin.

Jin, di navbera malên deara û mala taybet de hatine parvekirin. Hemû hêz û taybetiyên xwezaya civakî girêdayî mêr kirine, pir kêm jî be bi taybetî, taybetiyên weke: bêhêzî û kêmasî jî tên têgihaştin, ji jinê re hatine "bexşandin".

Ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdulah Ocalan, dibeje: "Kengî ji serdema jinê, derbasî serdema mêr bûne, ji aliyê jinê ve windahiyên mezin hatine jiyîn."

Ev rewş, destpêkê di efsaneên teşeya herî kevin a hişmendiya mirov de rastiya xwedawenda parçebûyî, di nava hev de şer dikin û li beramberî hev bêbawerî hatiye avakirin û wisa çêkirine.

Em bi taybetî li efsaneya Yûnanistanê dinêrin; xwedawend, jin bin jî, paşgotiniyê dikin, çavnebariyê dikin. Di bêbextiyan de cih digirin, derazber dikin. Îşkenceyê li mirovan dikin, bi çirtikî û meraqa zêde li ser serê mirovahiyê belayê dibarînin. Li gel van taybetiyên neyînî, hin xwedawendên ku taybetiyên wan ên erênî jî hene, lê di navbera wan û yên din de şerek heye. Efsane, weke hişmendiya herî demdirêj a bîra civakî ye.

Em dikarin, bi efsaneyê re rista hişmendiya mirov a ku ji koletiya jinê û li derdora wê ji koletiya mêr û civakê re vekirin, amadekirin û hînkirinê, baştir watedar bikin. Ev nasnameyên jinê, bi destê mêr çêbûne û hev du lawaz dikin. Nasnameyên xwedawendan têk çûne, lê hîn jî li ber xwe didin.

Bi daxwaza parastina xwe, dişibin mêr û bi demê re bandora wan namîne ku bi nav bikin. Xwedawendên ku di pêvajoyên serdema xwedawendiyê de lawaz bûne, nasnameya jinê ketiye bin serweriya mêr û bi hizirê mêr ê serdest ve hatiye avakirin.

ASÎNA (ATHENA)

Ji van mînakan a herî diyar **Asîna** ye, ku ji eniya Ziîyos, ango ji mejiyê mêr hatiye afirandin. Hevjîna yekem a Ziyos, Metîs ducanî dibe. Ziyos, Metîsê dadiqurtîne. Asîna, weke girêkekê di serê Ziyos de mezin dibe. Ji wê derê, bi zirx û mertal derdikeve. Taybetiya jîrekiyê ya ji bo vê xwedawendê: huner, stratejî, sirûş (îlham) û aştî ye. Di pêvajoyên pêş de bi mertala xwe, wê bibe xwedawendeke şer û di şerê Troyê de wê destekê bide Akhinis.



ATHENA

Asîna, mertaleke taybet hildigire. Bi xemlên cuda, li ser vê mertalê wêneya serê **Medûsa** (Jineke ku ji aliyê çanda zilam ve hatiye cinawirkirin) çêbûye. Porê wê, ji maran e. Teşeya jina ku jê re cin tê gotin. Di rastiyê de jî, jineke zanyar bû. Dosta xwezayê û agir bû. Ji bo zayenda xwe, şer kiriye. Ji aliyê kurê Ziyos, Peresyos ve serê wê hatiye birîn. Li pêşberî vê mertalê, artêşên herî bihêz jî têk çûne. Taybetiyên wê yên bingehîn, têkildarî bajar bûn.

MEDÛSA

RONÎKIRIN

Medûsa: Di mîtolojiya Yûnanistanî de Medûsa keçeke xweşik bû, keça Borisyos bû, xwedayê avê ye. Piştî ku li perestgeha Asînayê têkilî bi Bosîdon re daniye, vê yekê hiştiye ku Asîna pir bihêris bibe û wê dike jineke nexweşik ku porê wê mar e, kesên li çavên wê dinêrin dibin pizot. Borsiyos bi şûrê xwe yê tûj û pêlava Hirmis ya bi wan dikare bifire, serê Medûsa qut dike û weke diyarî dide Asîna.

MEDÛSA

HERA

HERA

Xwedawendeke din a ku hişê mêrê serdest ew afirandiye, hevjîna Ziyos “jina çilek”, pitpitok, fesad, ango jina ku mêr ew afirandiye **Hera** ye. Hera, hem xwişka Ziyos bû, hem jî hevjîna wî bû (Di demên berê de bi endamên mala xwe re dizewicîn). Weke serxwedawend û keybanûya hevjîniyê hatiye naskirin. Li gorî baweriya berê, di dema zarokanînê de parêzvana jinan û zewacan bû. Pir fêlbaz (xasûk) û kîndar bû.

ARTEMÎS

ARTEMÎS

Keça Ziyos, qiralê xwedayan Welîto, xwişka cêwî ya Apolo bû. Ew di mîtolojiya Yûnanistanî a antîk de xwedawenda nêçîr û zeviyan bû. Parêzvana zarokan, xwedawenda zarokanînê û keçkaniyê bû. Di dema zarokanînê de alîkariya jinan dike. Ev xwedawend, bi navên: nêçîrvanî, xweza, xwedawenda heyvê, xweşik û bibejnûbal dihat naskirin.

Parastina keçikên biçûk dike heya ku mezin dibin. Di destên wê de tîr û kevan hene û heyv jî li ser serê wê ye û ew xwedawenda keçikaniyê ye. Baweriya wê bi azadî û serxwebûnê heye. Işkenceke tund li kesê ku bixwaze keçkaniya wê bistîne dike, ji ber ku ji biçûkaniya xwe ve baweriya wê bi keçkanî û safîtiya wê hebû. Ev tişt li ser firşteyên wê jî pêk tê. Dema nas dike ku

firşteyeke wê ya bi navê Kalîsto ji Ziyos ducanî dibe wê bi tîrê xwe dikuje.

PANDORA

Pandora ya ku ne xwedawendek e jî, di efsaneya yûnanî de weke “jina xweşik” tê pênasekirin. Promîsyosê ku agir ji xwedayan diziye û daye mirovan, Ziyos pir hêrs kiriye.

PANDORA

Ziyos, “ji bo mêr, bibe sizayê herî fêlbazî” Pandorayê diafirîne. Tevî ku Promisyos, berê hişyarî daye birayê xwe ku tu diyariyan ji xwedayan negire, birayê wî dikeve bin bandora Pandoraya xweşik û pê re dizewice.

Ziyos, qutiyeke ku hemû xerabî tê de veşartî ne, daye Pandorayê. Ji bo merqê pê re çêbike, soz jê stendiye ku veneke. Lê Pandoraya ku jineke meraqdar e, xwe nagire û qutîkê vedike. Her wiha, hemû êş û xerabiyên mirovahiyê, zehmetî û mirinê serbest dihêle û di qutiyê de tenê hêvî dimîne.

Efsaneya ku ev xwedawend afirandine, Yûnanîstan e. Ango welatê ku bingeha felsefeya avanîsaziya fikrî ya deshilatdariya mêr û feraseta zanista pozîtîvîstê ye û bingeha cîhana rojava ya ku navenda kapîtalîzmê ye.

Pergala bi desthilatdariya mêr a ku hêza siyasî ya li pişt efsaneya yûnanî ye, dibêje: Heger xwedawend bin jî, erkên ku bidin jinan, bêtirî xwe wê, xweşikiya fizîkî, balkêşiya zayendî û dayîktî be.

Ev efsane, piştgiriyê dide belgeyên peyama di çîroka olî ya Hewa û Adem de ku bobelat bi serê mirovahiyê de aniye, jina meraqdar, ne dilsoza gotina xwe ye û li dijî fermana Xweda derdikeve, diafirîne. Dixwazin di hizira mirovan de baweriya ku ev taybetî, di xwezaya jinê de hene, bi cih bikin.

Tiştê ku em weke encam dibînin; nasnameyên jinê, bi mêr re hêza desthilatiyê parve dikin û mêrane dibin. Her wiha, şerê di navbera nasnameyên jinên ku radestî hêza desthilatdariya mêr bûne û bûne kole, ji aliyê mêr ve li dijberî zayenda xwe, mêrê dest ji azadiyê bernade û jinên ku li dijî hêza desthilatdariya mêr, dixwazin cewhera xwe biparêzin, şer dikin. Xwedayên mêr, êdî ew qas bihêz bûne ku êdî pêwîstiyê nabînin ku ew bi xwe; bi xwedawendan, an jî bi jin û mêrên ku ji wan bawer dikin re, şer bikin.

Bi heyînên ji mejiyê xwe, yan jî ji destê xwe afirandine; jinê bi jinê, yan jî jinê bi mêrê ji civakîbûna xwedawend û mirovan bawer dikin re didin şerkirin. Li derdora vî şerî, yekparetiya hebûna jinê, xweşikbûna wê û hebûna wê ya danûstandina bi xwezaya mêr re didin windakirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pandora, çawa hatiye pênasekirin?

2. Taybetyên mertala ku Asîna hilgirtiye, çi ne?

3. Artemîs, bi çi dihat naskirin?

4. Çi wateya şerên mirovan û windakirina hêviyê ye? (Lêkolîn bikin).

BEŞA ÇAREM

ŞKESTINA DUYEM (MEZIN) A ÇANDA ZAYENDÎ

1- **REŞKIRINA JINÊ BI RÊYA OLÊN YEKXWEDAYÎ**

2- **PÊŞBIRKA BIÇÛKXISTINA NASNAMEYA JINÊ**

3- **DAMARÊN BERXWEDÊR LI BERAMBERÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ– 1**

4- **DAMARÊN BERXWEDÊR LI BERAMBERÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ– 2**

WANE 1

REŞKIRINA JINÊ YA BI RÊYA OLÊN YEKXWEDAYÎ



Hewldanên birêkûpêk ên olên yekxwedayî yên ku ji bo civakîbûna li derdora jinê pêş ketiye, bidin jibîrkirin, pir bibandor bûne. Her wiha şop û sembolên ku ji wan deman mane, hatine berovajîkirin û xwestine ji kokê ve ji holê rakin. Ev hewldan, di heman demê de wêrankirina bîra civakî ye jî. Di encamê de ya ku xwestine bi mirovahiyê bidin jibîrkirin, ew demên ku jin tê de gihîştiye asta xwedawendiyê.

Di dîroka jinê de, bi pêvajoya olên yekxwedayî re çanda qedexe, şermkirin û reşkirina li derdora nasnameya jinê hatiye hûnandin. Nasnameya jinê, bi serê xwe kirine mijara ku jê bê şermkirin. Nasnameya jinaniyê, kirine çavkaniya bingehîn a hemû êrîşên birêkûpêk û bîrdoziyê. Koletiya li ser jinê sepandine û bi fermana xweda ve girê dane. Bi radestiya bîrdozî ya ku li ser jinê sepandine, di civakê de baweriya ku jin, lawaz û xerab e, bi pêş xistine.

ŞIKANDINA ZAYENDÎ YA DUYEM

Bi şikandina zayendî ya duyem re nasnameyên jinê yên serwer ên ku di pêvajoya baviksalariyê de, bi pêş ketine, weke: Nasnameya jina bêçare, nasnameya fahîşetiyê, xemla qesr û hareman. Nasnameya jinê ya dayîka xwedawend, ji bîra xwe dernaxe û heta mirinê li ber xwe dide. Jina dayîk, jina segvan, perî yan jî melek, ji rê derdixe yan jî cina mê ku ditirsîne

hatine binavkirin. Êdî jin, di civakê de ne kirde ye, tenê amûrek e.

Ji xwedawendiya civaka xwezayî, tu berhem û nîşan nemaye.

Ji bîrdoziya serdema heqîqetê ya ku li derdora jina dayîk pêş ketiye, ber bi serdemeke binelet ve ye. Ji avahiya sincî û ramyarî a jiyana civakî ya li derdora jinê pêş ketiye, weke ku em ketibin nava avahiyeke sexte û riziyayî. Ji bo ku mirov têbigihêje nasname, hebûn û xwezaya jinê; di nava vê cudabûn û rizîbûnê de çawa teşe girtine, divê zanista erdkolanê, binarînî li ser van deman bisekine.

Kesên afirîner ên ku di civaka xwezayî û serdema hiyerarşiya erênî ya serdema qehremaniyê de ji civakê re baş xizmet dikirin, di serdema koletiyê de li hemberî xweda-efendiyan, weke kesên herî tirsnak û gunehkar yên ku divê werin sizakirin, hatine naskirin.

Ev hemû, di encama duyem şikandina mezin a çanda zayendî de ku ji aliyê olên yekxwedayî ve di dîroka jinê de hatine destpêkirin. Ev şkandin, di olên yekxwedayî de weke fermana xwedê hatiye zanîn. Lê di destgirtina hebûna jinê ya di efsane, felsefe, zanist, çand û hunera ku piştre derketiye de, diyar bûye. Heta roja me ya îro jî, ya ku mora xwe li destgirtina nasnameya jinê daye, ev çanda şkandina zayendî ya duyem e. Piştî hilweşandina ola xwedawendê, di pêvajoya pêşbaweriya derbarê jinê hatiye afirandin û çavkaniya xwe ji olê digirtin, du nasnameyên jinê yên diyar hene. Ev her du nasname jî, ji afirîneriyên mejiyê mêrê desthilatdar bû. Ji van nasnameyan a ku destpêkê hatiye afirandin; Lîlîs bû. Ya duyem jî, Hewa bû.

JINA BERXWEDÊR: LÎLÎS

Lîlîs, cara yekem di destana Gilgamêş de tê dîtin. Giyaneke xerab a serwera şevê û cîhana binerdê ye. Di efsaneyên sumer, babîl û persan de bawer dikirin ku weke: jina

xwînmij, mar û kûçik e. Di 2400 B.Z de di nava gelên Mezopotamyayê de weke xwedawenda bi navê Lîl a ba û bahozên hilweşîner bû. Bi taybetî, li gorî baweriya cihû û xirîstiyanan jî Lîlîs, jina yekem a ku bi Adem re wekhev hatiye afirandin. Mêyeke serhildêr e. Angaşt kiriye ku bi Adem re wek hev be. Ji ber vê yekê, xizmeta wî ne pejirandiye. Ji bihuştê hatiye avêtin, yan jî bi dilê xwe dest ji bihuştê berdaye.



LILITH

Di rastiyê de Lîlîs, nûnertiya taybetiyên herî xurt ên nasnameya jina xwedawend a berxwedêr dike. Li hemberî gef û êrîşên desthilatdariya mêrê serdest a bisazî bûye û xurt e, serî natewîne. Ji aliyê pergala baviksalariyê ve hatiye naletkirin. Di rastiyê de Lîlîs, nasnameyeke pir tirsnak a li derveyî pergalê hatiye hiştin.

Lîlîs, heta roja me di çanda pir gelan de hîn jî bi navên cuda heye. Di efsaneyên kurdan de bi navên weke: perî, sêhrkar, Helika Gişkin, Elka Şevê, Pesewe, Lamîa û Leyla hîna dijî. Di baweriya çanda gelên kafkas, faris, kurd, rûs û tirkan de, navê wê Al e.

HEWA

Di zimanê Ibranî de, di tewratê de navê wê Hevah hatiye nivîsandin. Di zimanê yûnanî de Eva ye, bi latînî jî Heva ye. Li gorî tewratê weke dayîka hemû zindiyan tê naskirin û ji parsiwê 13'em ê milê rastê yê Adem hatiye afirandin. Lê di Quranê de navê wê û afirandina wê ya ji parsiwê Adem jî derbas nebûne. Ew di Quranê de weke hevjîna Adem hatiye naskirin, her wiha di hinek hedîsan de jî navê wê derbas dibe.

Li ser Hewa nêrînên ola Islamê û nêrînên ola Mûsewî û Mesîhî hinekî ji hev cuda ne, lê tiştên hevbeş jî hene. Her wiha çîrokên di nava gel de jî hinekî cuda ne. Li gorî Tewratê Xweda Hewa û Adem xistine buhiştê û ji wan re gotiye fêkiyê dara zanebûnê nexwin, piştre mar Hewa dixapîne û dihêle bixwin. Dema ku ji dara hatiye qedexekirin dixwin, tên cezakirin û insan ji buhiştê tên avêtin. Ev çîrok di Quranê de cuda ye. Di Quranê de her du ji aliyê şeytan ve tên xapandin. Hewa weke berdewama pîroz ya jiyanê tê naskirin. Lê bi taybet di ola Mesîhî û Mûsewî de "**gunehkara yekem"** hatiye naskirin. Ew jî li hemberî jinan hatiye bikaranîn. Her wiha di Tewratê de tê gotin ku ew ji parsiwê xwar ê Adem hatiye afirandin û bûye sedem ku jin li gorî zilam kêm were dîtin. Di Quranê de tevî ku tiştekî wisa tune ye jî hinek oldar şîroveyên Tewrat û Incîlê bingeh digrin û jinê pê biçûk dixin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Bi şkandina zayendî ya duyem re jin çawa hatine binavkirin?

2. Lîlîs, kî ye, bi çi jî tê binavkirin? Bi kurtasî şîrove bike.

3. Çi wateya çanda fedîkirin û reşkirinê ye? (Lêkolên û nîqaş bikin).

WANE 2

PÊŞBIRKA BIÇÛKXISTINA NASNAMEYA JINÊ

Ev vegotin nîşan dide ku tevî hemû êrîşên bîrdozî û fizîkî, nasname û çanda dayîka xwedawend, li hemberî teşeyên nasname, hebûn û afirandinên ku desthilatdariya mêr li ser wê sepandine, serî hildaye.

Her wiha, di her keysa ku dibîne de dixwaze bi nirxên xwe û hêza mejiyê xwe, ji nû ve çalak bibe. Wisa zû bi zû, serî ji xweda re natewîne. Mejiyê mêrê desthilatdar, dibîne ku teşeya hizira efsaneyî kêm dimîne. Ji bo hebûna jinê bixe bin serweriyeke dijwar, bi her alî ve kedxwariya wê bike û wê diyar bike; fermanên ku xweda razber kirine, diafirîne. Li ser vê, jin di hêla mejî û giyanî de ji afirandinê re lewaz e. Her du derfetên afirandina xweda dane, baş bikar neanîne. Mêr jî ji rê derxistiye, weke vegotina pîroz pêş dixe.

Hişmendiya zayenda xerab, li ser hîmên saxlem dide rûniştandin. Êdî jin, dema ku li dijî vê derkevin, wê li dijî fermana xweda derkevin. Vê rewşê, bi hezarê salan berxwedaniya jinê ya hundir, bi tirsa ku li dijî xweda derketinê, şkandiye. Ji mêr re erkên bêsînor ên ku tirsê domdar bike, pêşkêş kiriye.

Hema bêje di hemû çîrokên olên yekxwedayî de yên ku hatine afirandin û avêtina ji bihuştê, bi awayekî rêkûpêk dijminatiya jinê hatiye kirin. Di dîroka olan de bêhejmar mînak hene ku vê pir balkêş nîşan didin.

Di demên xwedawendiyê de ku bi hêza xwe ya berê nebe jî, hîn jî pir xurt dihat jiyîn, ola yekxwedayî ya destpêkê derketiye, cihûtî ye. Ev ol, ji derketinê heta roja me, di destgirtina hebûna jinê û kolekirina wê de, bi risteke pir neyînî rabûye. Baweriya xwedawendê, qedexe kiriye. Qadên baweriya xwedawend lê hene, bi fizîkî tune kiriye.

Biçûkxistina hebûna jinê, ji zimanê mêr veguherandiye lavaya (duaya) serê sibehê: “Xwedayê me yê heta hetayî, qralê hebûnê, hemd ji te re ji ber ku te ez jin neafirandime.”

Di biçûkxistina nasnameya jinê ya xwediyê van hiziran de, nasnameya jinê ya ku xwe spartine, nasnameya Hewayê ye. Li derdora vê nasnameyê, jin berpirsiyara bobelatên hatine serê mirovahiyê ye. Bi gunehê destpêkê ve mirovahî ji bihuştê daye qewitandin. Hewa, jina ku bawerî bi mar aniye û ji dara ku Xweda qedexe kiriye, xwariye tê pênasekirin. Pirtûka pîroz, bi vegotina vê çîrokê re nasnameyên xwedawendê, sembol û bajarên wê, çawa bi erdê re kirine yek jî, vedibêje. Cihûtî, bi giranî derb li xwedawendiya ku nasname û hebûna jinê ya herî xurt pêk hatiye, xistiye. Ji ber vê yekê jî jin, êdî ji çavkaniya hêzê bêpar, bêhêz û bêçare maye.

Hemû sûc û gunehan, dikarin bixin stûyê wê. Her wiha, ji bo ku hemû taybetiyên jinê yên di dema xwedawendê de werin tunekirin, ev “guneha destpêkê” kiriye û kêmasiyên jinê yên çavkaniya vê tên nîşandan, bûye sedemeke baş. Hebûn û nasnameya jinê, êdî wê ji siya vê çîroka pîroz rizgar nebe. Olên yekxwedayî; der barê xwezaya jinê de, cih û rista wê ya di civakê de bi rêzikên ku xwe dispêrin fermanên xweda, ava kirine. Di civakên çîndarî yên ku baviksalarî tê de pêş ketine û piştî demekê hatine pejirandin de li dijî jinê nirxên beriya wan pêş xistine, wê dewr girtibûna.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Mejiyê mêr, ji bo çi fermanên ku Xweda razber kirine, diafirîne?

2. Çima hemû sûcan (tewanan) dixin stûyê jinê?

WANE 3

DAMARÊN BERXWEDÊR LI BERAMBERÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ - 1

Çanda xwedawendiyê û pergala civaka jina dayîk, têk çûbe jî, bandora wê bi hezarên salan berdewam kiriye. Van bandoran, di jiyana civakî de nasnameyên jinê jî, diyar dikirin. Jinan, di dil de ji dayîka xwedawend û nirxên wê, bawer dikirin. Di her derfetê de dest ji jiyîna li gorî wan bernedidan. Di dîrokê de mînakên bi vî awayî pir in. Jinên ku hevjînên pêxember in, keça wî an xwişka wî ne. Ango weke di qraltiyan de jinên ku hevjînên qral in, keça wî û xwişka wî ne, bi bandora baweriya pir xwedayî berdewam dikir. Nêrîna mêrê serdest ku di nivîsandina dîroka civakî de serwer in, xwestine van jinên bihêz, di nava nezelalbûnekê de bihêlin. Lê çi qas xwestibin veşêrin û berovajî bikin jî, ji bo em wan bibînin ji me re şopên saxlem hiştine.

Pêvajoya olên yekxwedayî, di nasnameya jinê de şkestina çandî ya duyem daye jiyankirin. Nasnameyên jinên vê demê, cur bi cur in. Di her komê de bi hezaran nasnameyên jinê yên cuda ku reseniyeke wan û bi sekneke girêdayî xwe hene. Ev nirxên bêhempa yên Rojhilata Navîn, heta niha bi hêjayî nehatine pênasekirin û naskirin. Ji ber ku îro çavkaniya hemû taybetiyên me yên li ber xwe didin, ev dewlemendî ne.

Em dikarin nasnameyên jinên vê demê, lêkolîn bikin.

A) NEFERTÎTÎ

Keybanûya Misirê ya di sedsala 14 yê B.Z de jiyaye. Bi Amanhotepê 4' em e (Akhenaton) ê Fîrewnê Misirê re ku hevjînê wê ye, li ser text maye. Dayîk û bavê wê, keybanû û qiralê Mîtaniyan e. Di dîroka Misirê de jina yekem e ku bûye Fîrewn.

Zagonekê derdixe ku jin jî karibin bibin Fîrewn. Ji ber ku xwestiye bi Akhenaton re li şûna xwedayên Misirê, baweriya xwedayê yek Aton (Xwedayê Roj) pêş bixin, pir bertekan dibînin. Jixwe, bi lêkolînên destpekê yên ku li ser hestiyên Nefertîtî hatine dîtin, xuya dibe ku li serê wê dane û wisa hatiye kuştin.

B) POTÛHEPA (PUDUHEPA)

PUDUHEPA

- Hevjîna serwerê Hittitê Hattusiliyê 3' yem e, di sedsala 13 yê B.Z de jiyaye û keybanûya împaratoriya Hittit e.
- Puduhepa, xwe weke xizmetkara Hepata Xwedawenda hûriyan didît. Di heman demê de xwe weke Xwedawenda Rojê Arînna ku jê hez dike jî, bi nav dikir.
- Di perestgeha Hittitê de vesazkirineke ku xwedawend û xwedayên her du çandan weke hev kiriye.
- Di nava keybanûyên Hittitê de Puduhepa piranî tevlî jiyana ramyariyê bûye.
- Ji nameyên hatine dîtin, derketiye holê ku Puduhepa bi gelek qiral û keybanûyên wê demê re nivîsarên fermî kiriye. Weke di Tavanana (bi Hittit, nasnavê ku ji bo hevjîna qral tê dayîn) yên beriya wê de bûye, di dema keybanûtiya Puduhepa de jî, li ser gelek diyariyên qraliyetê, yan jî mora wan bi qasî navê qoral, navê Puduhepa jî hebûn.

- Yek ji taybetiyên ku Puduhepa di nasnava xwe de bi kar dianî jî, "Delala ber dilê Xwedawenda Rojê Arînayê, xizmetkara Xwedawendê" ye.
- Puduhepa, piştî Hattuşîliyê sêyem di dema qiraltiya kurê xwe Tudhaliyayê çarem de jî, bi nasnava Keybanûya dayîk bi rê ve biriye.
- Yek ji erkên Puduhepa jî, serokatiya jiyana dadgehê ye. Ji belgeyên ku ji wê demê mane, tê naskirin ku li dijî şaşîtiyên di dema xwe de têkoşîn kiriye.
- Puduhepa, di heman demê de xwediya zanîneke teolojiyê (zanista ku vekolînan li ser pirtûkên olî dike) ya bilind û di qada dîplomasiyê de xwediya daneheveke xurt bû.
- Di nameyên ji qiral û keybanûyên welatên biyanî re û peymanan de nasnavê xwe bi kar dianî.
- Li Hattê û welatê xwe Kizzuwatnayê (kîzotna li Meraş e bajarekî nêzî Efrînê ye), hemû belgeyên nivîskî yên hene, girêdayî bawerî û çanda Hûrrî daye çapkirin. Ev taybetiyên xurt, nîşan didin ku wê perwerdeyeke baş wergirtiye û xwediya daneheva çandeke dewlemend e.

C) KEYBANÛYA SABAYÊ BELQIS (MAKEDA)

Derbarê wê nêrînên bi hev re nakok û xwe dispêrin çavkaniyên cur bi cur hene. Ji navê wê bigire heta nasnameya wê, ji kîjan netewê tê, baweriya wê, keseke bi vî navî jiyaye, yan na? Li gorî hin çavkaniyan, ew Lîlîs e. Li gorî hinan, keybanûyeke keça wezîr û keybanûyekê ye. Li gorî hinan jî, dayîka wê cin û ew bi xwe jî sihirbaz e. Tê gotin ku 40 salî li ser text maye. Hebûn û jiyana wê, di piş perdeyeke razdar û efsaneyî de ye. Nerînên hevbeş agahiyê didin ku li Etiyopyayê,

BELQIS (MAKEDA)

yan jî li Yemena îro serwerî kiriye. Di Quran û Tewratê de pir behsa wê tê kirin. Ev jî tîne bîra mirov, ku di serdema Keybanûya Sabayê de jiyaye (li gorî tê gotin, di sala 1020'an B.Z de ye), sembola nasnameya jineke ku qadeke fireh, dewlemend û bihêz di dest wê de ye û heta bêjî bibandor e. Belqîs, Makeda yan jî bi navekî din be jî, ew sembola nasnameyên jina xurt a ji çanda xwedawenda dayîk a serdema xwe, xwedî bûye û li gorî pirtûkên pîroz, ji kevineşopiyeke ku perestinê ji rojê re dike, tê.

Ç) DÎDO

Navê wê Elissa yan elîsar e. Keybanûya bajarê Sûrê yê paytexta fenîkeyiyan e. Damezirînera bajarê Kartaca ye. Li Efrîkaya Bakur di sedsala 9 ê B.Z de jiyaye. Navê Dîdo ku tê wateya gerok, dîroknivîsên Latîn lê kirine.

D) SEMIRAMIS

Li Babilê, xwedawenda beriya Îştarê ye. Semiramis, xwedawendeke keybanûya asîman û weke dayîka pîroz tê pejirandin. Tê têgihaştin ku keybanûyeke piştre di sedsalên (9-8) ên B.Z de li ser van axan (li gorî Heredot, di 810 ê B.Z de jiyaye) bi heman navî

SEMIRAMIS

derketiye.

Jixwe, di efsaneya derketina Semiramisê de Îştar diyarker e. Watedar e ku wateya navê Semiramisê “ya ji kevokê tê” û çivîka pîroz a Îştarê jî, kevok e.

Nasnameya jina di serdema baweriya dayîka xwedawend de ya bihêz, şerker, delal, bawerî bi xwe heye, aliyê wê yê civakî li pêş e, bi taybetiyên birêveberiya jinê ya desthilatdariyeke erênî ve dijî, ji aliyê civaka xwe ve hatiye xwedawendkirin û hezkirin.

Em dikarin ji bo Semiramisê bibêjin؛ kesayeteke sembol a serdemên desthilatdariya mêr ava dibe, lê ji bo ku baweriya dayîka xwedawend tune nebe, li ber xwe dide. Dema ku li dora wê hêrsa desthilatdariyê bi pêş dikeve û kurê wê bi alîkariya rahîban, dixwaze wê bikuje, ji desthilatdariyê dûr dikeve, dibe kevokek û ber bi çol û cihên xwe yên azadiyê ve firiyaye. Ev rastî jî nîşan dide ku Semiramis, sembola giyana jinê û lêgerînên wê yên bêdawî ye, ku dest ji civaka birêveberiya dayîkê bernade.

E) JINÊN AMAZON ÊN ŞERVAN

Amazon xwe weke ‘keçên heyvê’ binav dikin. Bi çanda Kîbele û Artemîs bawer dikin. Navê van ji gotina farsî ‘ha-mazan’ hatiye. Ev jî tê wateya şervan, jinên ku bi zilaman re şer kirine. Zarokên xwe li cem xwe girtine û jiyaneke bi serê xwe ava kirine. Kesê cara yekem behsa Amazonan kiriye dîroknasê bi nav û deng Heredot e. Heredot ji bo Amazonan dibêje "jinên ku weke zilaman şer dikin." Amazonan ji bakurê Anatolia heya Yûnanistanê bajar ava kirine.

Hinek dibêjin ku ev gotin ‘a-massein’ jina ku kes nikare destê xwe bide wê.

Hinek kes jî dibêjin ku peyva Amazon bi zimanê yûnanî tê wateya bê memik. Ji bo ku jin bikarin baş şer bikin û tîr û kevan bi kar bînin, memikên xwe jê dikin. Lê ev ne rast e, ji ber ku tu delîl nîne ku van jinan memikên xwe jê kirine. Ne pêwîst e ji bo şerkirinê memikên xwe jê bikin. Ev hişmendiya nivîskarên zilam in.

JINÊN AMAZON DI DEMA ŞER DE

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Çawa şkestina çandî ya duyem, hatiye jiyîn? (Lêkolîn bikin).

2. Nefertîtî, kî ye û çawa hatiye kuştin?

3. Puduhepa, çi di nasnavê xwe de bi kar dianî?

4. Çima Semiramis, li ber xwe dide?

5. Jinên Amazon, kî ne?

LI BERAMBERÎ ŞKANDINA ZAYENDÎ DAMARÊN BERXWEDÊR – 2

F) KLYOPATRA 7

Keybanûya Misirê ye. Di navbera salên 69-30 B.Z de jiyaye. Ji bo ku welatê xwe biparêze û bi rê ve bibe, bi Sezar re hevkariyê dike. Piştre jî, bi fermandarê Romayê Antonîus re hevkariyê dike. Klyopatra, 9 zimanan dizane û pir jîr e. Dema ku ji bo welatê xwe şer dike, çawa li dijî Romayê têk diçe, bi jehra tûlemarê (kobrayê) xwe dikuje.

KLYOPATRA 7

G) ZENÛBYA

Di navbera salên 240 û 274'an de jiyaye. Keybanûya imperatoriya Palmîrayê bû, ku li Sûriyeyê serwerî dikir. Li bajarê Palmîrayê (Tedmûr) ji dayîk bûye û li wê derê mezin bûye. Tê gotin ku ji malbata keybanûya Misirê Kleopatraya 8'em e. Zenûbya, bi xweşikbûn û jîrbûna xwe dihat naskirin. Tê gotin ku bi yûnaniya kevin, aramî, erebî û latînî dizanîbû û bala wê li ser dîrokê bû. Zenûbya, di 267'an de piştî mirina hevjînê wê, ew birêveberiyê dike. Ji bo ku Palmîrayê ji bindestiya Romayê derxîne,

ZENÛBYA

qebîleyên samîtîkan digihîne hev. Di demeke kin de qada desthilatdariya imperatoriya Palmîrayê, berfireh kiriye. Sûriye, Libnan, Filistîn, Misir û herêmên başûr, rojhilatê Anatolyayê û Asyaya biçûk girtiye bin serwriya xwe. Piştre di şerê imperatorê Romayê Aûrelîan de têk diçe. Li gorî hin çavkaniyan tê gotin, ku ji aliyê imperatorê Romayê Aûrelîan ve tev li kurê xwe dîl tê girtin û li bajarê Tîbur ê Îtalyayê bi darê zorê tê bicihkirin. Li gorî hinan jî, heman mîna Klyopatrayê jehr vexwariye û hin jêder dibêjin ku şûrek ji leşgerekî girtiye û xwe pê kuştiye. Zenûbya, weke "Keybanûya Şerker" hatiye binavkirin. Li gel ku bi sedsalan e baweriya xwedawendiyê hatiye hilweşandin jî, Zenûbya, ji şopdarên baweriya xwedawendiyê bû. Di heman demê de bi hêza hizirî ya Zenûbyayê ya ku hîn dest ji baweriya xwedawendiyê bernedaye, girêdayî ye. Nasnavê din ê ku dilsozî baweriya dayîka xwedawend bû jî, navê Wahballat, ango "Diyariya xwedawend" li kurekî xwe kiriye.



H) HZ. XEDÎCE

Hz. Xedîce jineke bazirgan û dewlemend bû. Mînaka Hz. Xedîce jî nîşan dide ku gelek jinên vê serdemê yên hêzdar hebûn. Piştî ku du caran zewicî ye wê bi xwe Hz. Muhemed ji xwe re weke hevjîn hilbijartiye. Gelekî alîkariya Hz. Muhemed dike û dema ku Hz. Muhemed dibe pêxamber yekemîn kesayeta ku jê bawer dike Hz. Xedîce ye. Hz. Muhemed, heya ku Hz. Xedîce dijiya, bi jineke din re nezewiciye.

I) HZ. EYŞE

Hz. Eyşe jî kesayeteke girîng a wê demê ye, ku mîna "Dayîka Bawermendan" tê zanîn. Hz. Eyşe li ser îlahiyat, bijîşkî û helbestê, zanînên wê pir xurt bûn. Bi taybetî, piştî ku Hz. Muhemed jiyana xwe ji dest dide, tev li şerê desthilatdariyê yê di navbera xelîfeyan de dibe û wiha jî têk diçe. Bi êşeke mezin, nirxê jinaniyê hîn dibe û dibêje; "Ey xwedan, li şûna ku te ez jin çêkirim, te ez kiribama kevirek"

Î) HZ. FATMA

Hz. Fatma keça Hz. Muhemed û hevjîna Hz. Elî ye. Mehra Hz. Elî ya bi Hz. Fatma re bi merc e ku Hz. Fatma, kengî bixwaze, mafê wê heye ku Hz. Elî berde. Hz. Muhemed ji bo wê gotiye ku cihê wê li bihuştê ye. Li ser navê Hz. Fatma gelek gor û cihên pîroz hene. Her wiha jinên şifager dema ku nexweşekê/î sax bikin dibejin "ev ne destê min e, ev destê dayê Fatmayê ye". Destê Hz. Fatma di heman demê de sembola xwedawend Îsîs û Îştarê ye.

J) RABIE ELEDEWIYE

Di dema îslamê de yek ji qadên tê de nasnameyên jinên girîng pêş ketine jî oldarî, sofîtî (tesewufî) ye. Yek ji van jî, Rabie ye. Jê re gotine "Hemû dilpakî li serê mêran belav kirine, taca mêrxasiyê danîne ser serê wan, kembera rûmetê li nava wan pêçane, tu jin

weke pêxember, nehatiye şandin. Rewş her ev e, tu çawa dikarî di van mijaran de biaxivî?" Wê jî wisa bersiv daye: "Belê, gotinên we rast in, lê xwebûn, xwe ecibandin, perestina xwe û ji xwe re danperestin, gotina 'ez Rebê we yê herî mezin im' jî, bi bejna me jinan de neanîne." Felsefeyeke kûr a Rabieyê hebû.

L) JINÊN WÊJEVAN DI OLA YARESANÎ DE:

Di nava yaresanan de bi taybetî, di sedsalên 7-8 û 12-13. de nêzî 12 an jî 15 jinên helbestvan hebûn. Hin ji wan: Celale Xanima Loristanî, Dayê Tewraza Hewramî, Rihan Xanima Loristanî, Lîza Xanim, Nazdar Xatûn û Nêrgiz Xanim in. Li derveyî helbestkariyê, taybetiyeke ku van helbestvanên jin girîng dike; di heman demê de pêşengên olî ne. "Berhemên helbestî yên di rîtuelên Yaresanan de bingeh girtine, di heman demê de nivîskarên pirtûkên pîroz jî bûn. Ne tenê di berhemên helbestî, nivîsarên (metnên) olî yên ku bingehên sincî, şîretên olî û perestinê diyar dikin de jî; beşek ji aliyê mêr, beşek ji aliyê jinan ve hatine nivîsîn."(Mehmet Bayrak).

Rewşeke taybet a girêdayî dema ola xwedawenda dayîk serwer bûye ku jin û mêr bi hev re pirtûkên baweriyeke pîroz nivîsandine. Lê piştî baweriya dayîka xwedawend hat hilweşandin û olên yekxwedayî serwer bûn û şûn de jin ji aliyê pirtûkên pîroz ve hatin reşkirin. Ji ber vê yekê, di nivîsîna pirtûkek pîroz a gelekî de hîna cihgirtina jinê, hêza berxwedana jinê ya li wê derê nîşan dide. Ev, di heman demê de berxwedaniya gelê kurd a di tewereya jinê de ye. Baweriya xwedawendî bi rengekî veşartî hatiye naskirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Zenûbya, kengî Palmîrayê bi rê ve biriye?

2. Hz. Eyşe, kengî nirxê jinaniyê hîn bûye?

3. Wêjevanên Yaresaniyan ên tên zanîn, kî ne? Hinekan binivîse?

4. Lêkolînê li ser olên ku baweriya wan bi muzîkê tê bikin?

BEŞA PÊNCEM

SERDEMA KAPÎTALÎZMÊ

1. **KÛRBÛNA KOLETIYA JINÊ**
2. **NAMÛSA MÊR**
3. **NASNAMEYA JINÊ YA AQILÊ ZILAM**

WANE 1

KÛRBÛNA KOLETIYA JINÊ



Bandorên neyînî yên şkandina zayendî ya duyem li ser jin û civakê bi pirbûnê ve dewam kirin. Şkandina zayendî ya duyem a ku bi riya olên yekxwedayî hat pêşxistin, di demên dirêj de bi qilif û rûpoşên cur bi cur ve tê berdewamkirin. Ev şkestina ku heta vê demê hatiye, ji van deman dest pê dike, felsefe û zanist jî piştgiriya vî tiştî dikin. Di encamên wan pêvajoyan de jin ji zayendeke zindî wêdetir, weke nijad, çîn û neteweke şêwe digire. Dibe ku weke: nijad, nifş, an jî netewa herî pir hatiye çewisandin û bindestkirin. Tu nifş, çîn, an jî netew, weke jinê, rastî koletiyeke kûr û birêkûpêk nehatiye. Dîroka jinê ya ku di tarîtiyê de hatiye hiştin, ji nêz ve têkiliya wê bi desthilatdariya dewletperest û hiyerarşiya di civakê de bilind bûye, heye. Piştî ku jin hînî koletiyê hat kirin, di nava beşên din ên civakê de rê li ber koletiyê hat vekirin. Kolebûna mêran, piştî koletiya jinê tê. Cudahiya koletiya zayend a ji koletiya çîn û neteweyan heye. Koletiya zayend, tevî zordestiyeke hişk û nermik, bi derewên hîsbarkirî tê rewakirin. Cudahiya zindî, weke sedemekê ji bo koletiya wê tê bikaranîn. Hemû karên dike, bi gotina; "karên pîrekî" sivik tên dîtin. Ketina jinê ya nava gelemperiya civakê, ji aliyê olî û sincî ve weke şerm tê pejirandin. Her ku diçe, ji çalakiyên girîng ên civakî dûr tê xistin. Xebatên ramyarî, civakî û aborî pir ketine destê hêza serdestiya mêr. Qelsî û lewaziya jinê, weke saziyekê cih digire.

ÇAVKANIYA SERMIYANIYÊ

1. Piştî ku hemû derfetên şênberî û razberî ketin destê mêr, êdî jin dibe ya ku li destê wî binêre. Carinan lava dike, li ber digere û carinan hemû rûmeta xwe binpê dike û serî li ber çarenûsa xwe ditewîne. Pir caran jî, dixeyide û xwe bi bêdengiyeke mezin dinixumîne. Bi gotineke din, mirov dikare jê re bêje; **miriya dijî**. Kûrbûna koletiya jinê, tê afirandin. Di encamê de civakeke mezin a zayendperest hatiye afirandin.

2. Pergala desthilatdariyê di destên mêr de ye. Desthilatdariya mêr a di nava sînorên malê de, weke awayê dewleta biçûk tê afirandin.

3. Mêr, ji bo jinê her kiryara ku hewce bibîne, mirin jî di nav de rewa dibîne. Jina malê, çi qas sermiyaneke kevin û kûr be jî, bi hîseke bêsînor a sermiyanê ve dibêje; **"pîreka min e**." Jin, li ser navê hevjîniyê jî, nikare angaşteke biçûk a maf jî li mêr bike. Lê mêr, bêsînor dikare doza mafan li jinê û zarokan bike.

4. Di çavkaniya sermiyanê de jina kolekirî heye. Koletî û sermiyana ku li ser jinê hatine danîn, pêl bi pêl li tevahiya civakê hatine berbelavkirin. Bi vî awayî, her hîs û ramana koledar û sermiyanperest, di tevger û hişmendiya kes û civakê de hat bicihkirin. Di vê çarçoveyê de civak tê wê astê ku li gorî avaniyên dewletperest û her cure hiyarerşiyê amade bibe. Ev jî, tê wê wateyê ku her cure avaniyên ji wan re şaristaniya çîndarî tê gotin, bi awayekî hêsan û rewa dikarin hebûna xwe dewam bikin. Ji ber vê yekê, ya winda dike; ne tenê jin e. Ji bilî kulmek dewletperest û hiyarerşiyê, hemû civak winda dike.

5. Taybetiyên weke: fahîşe, fenbaz, çilvir, xerabî û hwd... bi awayekî bêrehm ji aliyê mêr ve lê hatine kirin. Afirînerê rastî yê fenbazî û fahîşetiyê, mêr e. Em baş dizanin ku di dîrokê de yekem malên deara ya tê zanîn, di salên 2500 ê B.Z. de li paytexta Sumerê Nîpûr bi navê mûsteqtîm ji aliyê desthilatdariya mêran ve hatiye vekirin.

Tevî vê yekê, bêyî ku şerm bike, weke ku fahîşetî afirîneriyeke jinê be, her tim di rojevê de digire. Berhem û gunehkariya ku bi xwe afirandiye, dixe stûyê jinê. Bi têgihîştina namûsê ya sexte ve tu reşkirin, lêdan û kuştinê ji ser serê jinê kêm nake.

Weke encam, em dikarin bibêjin ku nûnertiya jintiyê ya kevineşopî, ne fizîkî ye, civakî ye. Ji koletiya ku pê dane vexwarin, tê. Di warê civakî de malbat û zewac, weke bîreke bêbinî ye. Ev sazî, ji bo jinê; ji rikehekê derbasî rikeheke din bûyîn e. Nûnertiya desthilatdariya di nava civakê de heye, mêr di nava malbatê de dike. Kesên desthilatdar dema ku dizewicin li jinê wekî kole dinêrin. Koletiyên herî dijwar, bi vê saziyê re dest pê dikin û di nava malbatê de damarên xwe berdidin. Ji sedî sed jinê dike sermiyan, di warê ramyarî, hişmendî, civakî û aborî de bi paş ve dixe û dike ku careke din jin bi hêsanî bi ser xwe ve neyê. Têkiliya sermiyan û desthilatdariyê, li ser jinê tê afirandin. Ji bo ku cihê jinê yê di bin desthilatdarî û pergala sermiyanê de were pênasekirin, her ku diçe dijwartir dibe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Duyem şkestina zayendî, bi destê kê çêbûye?

2. Encamên pêvajoyên olên yekxwedayî, yên li ser jinê çi ne?

3. Kengî rê li ber koletiyê, hatiye vekirin?

4. Çima karê jinê ji aliyê civakê dibe rojev? (Nîqaş bike).

WANE 2

JIN Û NAMÛS

Di roja me ya îro de, jin weke encama hezarê salan, mîna berateyekê dijî. Jirêderxistina pergala kapîtalîzmê, hîna baş nehatiye dîtin.

Gelo namûs ji hêla zayendekê bi tenê ye?

Jin, li civaka Rojhilata Navîn tiştekе ku di navenda paşverûtiyê de cih digire. Mêrê Rojhilata Navîn ê têkçûyî, hemû tola xwe ji jinê hiltîne. Li derve çi qas were biçûkxistin, bi zanebûn berdêla vê yekê, ji jinê distîne. Mêrê ku nikare civaka xwe biparêze û rêya çareyê nabîne, hemû hêrs û tundiya xwe, weke dînekî di nava malê de li ser serê jinê û zarokan ditemirîne. Di bingeha bûyer û kuştinên “namûsê” de, ev rastiya balkêş heye. Ya rastî, mêrê ku namûsa xwe di warê civakî de binpê kiriye, berovajî vediguhere û hêrsa xwe li ser serê jinê ditemirîne. Bi awayekî pir sivik, sembolîk, neçar û xwepêşandaneke namûsperest, qaşo doza xwe çare dike. Weke ku psîkoterapiyê (eqliye) bike, tevdigere. Di binê pirsgirêkê de dozeke civakî û dîrokî ya windakirî, heye. Yek ji pirsgirêkên bingehîn, ew e ku ji vî “mirî” re divê were gotin, heta ku ew bi vê doza dîrokî û civakî re rû bi rû nebe û erkên dikevin ser milên xwe bi cih neyîne, wê tu carî nikaribe xwe ji vê qirêjiya namûsê rizgar bike. Namûsa rastîn, xwe ji bin bandora hemû desthilatdaran derxistine.

JIN PARÇEYEKE JI XWEZAYÊ YE

Di hişmendiya zanista nû de jin û xweza divê di bin serweriyê de bin û sembola giyana mê ya divê bihata bidestxistin bûn. Divê hemûyan, li ber aqilê mirov serî bitewanda. Ji aqilê mirov, armanca wan aqilê mêr bû. Ji ber ku aqilê xweza, jin, mirovên cîhana sêyem û reşikan nedibû. Di van deman de heta wê rojê pênaseyên efsane, felsefe û zanista berê ya ku der barê hebûna jinê de pêş xistibûn, yên dijminane, kirasekî 'zanistî' li wan kirin.

NÊÇÎRA SÊHIRKARAN



Di tevahiya hezar salên ku çanda dayîka xwedawend di bin êrîşên bîrdozî û fizîkî de diman, bi milyonan jin, li şûna radestbûna ji mêr re, mirin dipejirandin û nasnameyên jinan hebûn. Yek ji van nasnameyên jinê, 'sêhirkarî' bû. "Jinên sêhrikar" jinên bi nasnameya azad bûn. Di pêvajoya ku sermayedariyê dixwest serdestiya xwe saz bike, yek ji nasnameyên civakî ya dişewitand. Bi fizîkî jinên berxwedêr û zanyar, dihatin şewitandin û parçeyeke avaniya civakî ya xurt, dihat tunekirin. "Jinên sêhirkar" şopdarên dayîka xwedawend û "nûnerên dawî" bûn. Girêdana di navbera nêçîra sêhirkaran a ku kapîtalîzm bi pêş xist û hebûna jina kole ya îro de **ramyarê sosyolojiya azadiyê Abdulah Ocalan wiha**

dinirxîne: “Dema ku kapîtalîzmî dibe pergala serdest, bi şewitandina ‘jinên sêhirkar’ ku nûnerên dawî yên serdemên xwedawendan in, nûjentiya xwe ava kiriye. Ev rewşeke ku heta bêjî fêrker e û mirov dide hizirandin. Yek ji sêlingên destana nûjentiyê, kapîtalîzmî bi xwe dema ku şensê

pergalbûnê zeft kir, bi jiholêrakirina civakîbûnên sereke yên pêşî û paşiya dîrokê bûn, dest bi kar kir. Beriya her tiştî, bi dirûşmeya nêçîra sêhirkaran, hêza civakîbûna jinê ya hewl dida li ser pêyan bimîne, di nava agir de bi qirçeqirç şewitandin.

Mirov nikare nêçîra sêhirkaran ji sermiyanê, serbixwe bihizire. Di avakirina serdestiya xwe ya li ser jinê de weke koletiyeke kûr, ev dîmenên şewitandinê heta dawiyê li hesabê wî hatin.

Di roja me ya îro de bi vî awayî biçûkxistina jinê û ketina wê ya xizmeta pergalê, bi pêkanîna van şewitandinên di dema pêvajoya derketina holê ya serdestiya kapîtalîzm de, ji nêz ve têkildar e. Bîranînên saw ên şewitandinê, jin li Ewrûpayê bi awayekî bêsînor xistiye xizmeta mêr.”

Mîna Janne Darc (Jan Dark) lehenga netewî ya fransiz e. Di 18 saliya xwe de leşkerên Ferensayê bi rê ve bir û di çend

şeran de bi ser ket dema ku ji aliyê inglîzan ve hat girtin gotin ku ev sêhirkar e ji ber vê yekê ew şewitandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Bi çi awayî mêrê têkçûyî, hêrsa xwe di nava malê de ditemirîne?

2. Çima ji jinên zana re tê gotin sêhirkar in û bi vî navî dihatin şewitandin? (Nîqaş bikin).

BEŞA ŞEŞEM

ÇEND SEDSALÊN DAWÎ DI BERXWEDANA JINÊ DE

1. DAMARÊN BERXWEDÊR

2. ŞOREŞÊN JINÊ

3. HIZIRÎNA ŞOREŞEKÊ DI ŞÊWAZA JIYANA JINAN DE

4. SERÎRAKIRINA MÊTINGEHA HERÎ KEVIN

WANE 1

DAMARÊN BERXWEDÊR

Di dused salên dawiyê de jinan berxwedanên mezin pêşkêş kirin. Nirxên bêmirin ên têkoşîna azadiya jin û danehevên wê, afirandin. Ji hemû seriyên zilamên zordest re nîşan dan ku çanda xwedawenda dayîk, ne aşopiyek e.

Bîranînên şewitandinê yên jinên ku bi bihaneya sêhirkar in, li Ewrûpayê hatine şewitandin, hîna nû bûn. Lê li gel bîranînên vê bindestiyê, wê damarên jintiyê yên berxwedêr careke din biliviyana. Destên tevgerên ku bi cîhana felsefeya ronakbîrî, nûkirin û ronesansê ve jin tune dihesibandin, baş bihêz bibûn. Vê yekê jî, hêviya jinan neşikand.

Jinan, bi aqilê xwe yê hestyar ku ji dema dayîka xwedawend ve maye, bênavber pêhesiyan. Tiştên ku hemû olên yekxwedayî, felsefekarên xwe biaqil dihesibandin, ên şkence lê kirin; ji vî aqilî bikişînin hebûn. Dê vî aqilî tawana hemûyan a li hemberî jinê û xwezaya civakî, yek bi yek aşkere bikirana. Di van dused salên dawiyê de ev mejî her ku çû, bêtir hêzdar bû û berbanga sedsala azadiya jinê afirand.

Damarên berxwedêr ên jinê, di tevahiya sêsed salên ku xwestin nasnameyên jinê ava bikin de gavên pir xurt avêtin. Bêyî ku em bi hezaran qehremanên bênav ji bîr bikin, em dikarin li ser hin nasnameyên tên zanîn, bisekinin.

Bi hezaran jinên gerîla, femînîst, ekolojîst, li gel hemû sepandinên bi tundiya kapîtalîzmê dayîkên ku ji çand, civak û nirxên xwe qut nebûne, bêhejmar nasnameyên jinên berxwedêr ku em nikarin li vê derê binivîsin hene. Ger îro hê jî

têkoşîna azadiya jinê didome, bi saya van damarên berxwedêr ên hebûna jinê yên ku tu carî dest ji têkoşînê bernedane. Ev damarên berxwedêr, mohra xwe li hebûna jinê dane.

DAMARÊN BERXWEDÊR ÊN JINÊ

Li Fransayê, Olympe de Gouges, li Elmanyayê Rosa Luksembûrg, Ulrîke Meînhof, Clara Zetkîn, li Rûsyayê Aleksandra Kolontay, Krupskaya, li Îspanyayê Solores Îbarrurî, li Komara Domînîkê Xwişkên Mîrabel (Pepûleyan), li Libnanê Sena Miheydelî, li Filistînê Delal Maxrib, li Sûriyeyê Hamîde Tahir, li Kurdistanê Dayê Gulnaz, Leyla Qasim, Rindexan, Qadem Xêr, Keça Nexedeyî, Besê Anûş, Dîcle Kobanê, Xanim Yawerkaya, Ezîme Demîrtaş, Sakîne Kirmizitaş, Binevş Egal, Gulnaz Karataş, Zeynep Erdem, Zeynep Kinaci (Zîlan), Sema Yuce, Sakîne Cansiz, Arîn Mîrkan, li Tirkiyeyê Nezîhe Mûhîttîn, Fatma Aliye, li Amerîkayê Emma Goldman, Angela Davîs, li Brîtanyayê Alîce Paûl, Lûcî Burns, Emîly Davîson, li Efxanistanê Meena Keshwar Kamal.

ZEYNEP KINACI (ZÎLAN)

SENA MIHÊDELÎ

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di du sed salên dawiyê de jinan çi nîşan dan?

2. Jinên berxwedêr ên Kurdistanê, kî ne?

3. Sedema berdewamiya têkoşîna azadiya jinê, çi ye?

4. Li ser hin jinên ku li ber xwe dane lêkolîn bike. Û weke çîrok ji hevalên xwe re ragihîne.

WANE 2

ŞOREŞÊN JINÊ

ŞOREŞA FRANSAYÊ

Di Cotmeha 1789'an de ji ber berxwedanên jinan ên cur bi cur hatine jiyîn, di Şoreşa Fransayê de weke rojên jinê tê bibîranîn.

Jinên ji qeyrana aborî bêtir bandor dibûn, di sibeha 5'ê Cotmehê de bi awayekî serhildêr kom dibin. Ev raperîneke nan e. Nêzî 8 hezar jin, bi leşkeran re şer dikin û qesra Versaillesê dagir dikin. Piştî vê dagirkirinê, qral neçar dibe ku hin mafên gelê fransiz bide. Zagona hilbijêriyê, tê derxistin. Lê mafê hilbijartinê, ji bo jinan nayê dayîn.

THEROIGNE DE MERICOURT

Di nava yên ku ber bi qesrê ve dimeşin de jineke bi navê **Theroigne de Mericourt (Tirwayîn Do Mîrîkor)** jî heye, bi hêza xwe ya ajîteyê û peyama xwe ya bibandor girseyê radike ser pêyan. Gelek caran tê girtin, lê ji têkoşîna xwe venagere. Di civatên ramyarî yên ji bo jinan damezirandiye

de waneyên perwerdeyê, gotûbêjan û çanda giştî dide û jinan birêxistin dike. Di şerê navxweyî de li hemberî Jirondenan (endamên partiyeke ramyarî ne, di dema şoreşa Fransayê de

OLYMPE DE GOUGES (Olîmp Dê Xoc)

hatiye çêkirin) şer dike, tê girtin û şelaqkirin (qamçîkirin). Piştî îşkenceya ku dibîne, dîn dibe.

Piştî van berxwedanan, di 25'ê Gilawêja (tebaxa) 1789'an de danezana mafê mirovan a hemwelatiyê tê weşandin.

Olympe de Gouges jî, şoreşa Fransayê bi coş û hêvî pêşwazî kiriye. Lê belê piştî demeke kin, dibîne ku mafên jin û zilaman wekhev nayên dayîn. Ji ber vê yekê, li hemberî vê daxuyaniya ku jinan weke mirov nagire dest, di Rezber (Îlona) 1791'ê de daxuyaniya mafên jin û hemwelatiyên jin diweşîne. Daxuyanî, bi van gotinan dest pê dike; “Wê ev şoreş, heta ku hemû jin mafên xwe yên di civakê de winda kirine, negirin û çarenûsa xwe ya jandar dernexin zanabûnê, neqede.”

Olympe de Gouges, di daxuyaniyê de dibêje; **“Jinê, şiyar be!** Zengilên mejî di hemû cîhanê de tên bihîstin, mafên xwe bizane.” Û bang li jinan dike ku ji bo bidestxistina mafên xwe têbikoşin.

OLYMPE DE GOUGES

Olympe de Gouges, di sala 1748'an de li başûrê Fransayê ji dayîk bûye. Dibistan nexwendiye. Xwe perwerde dike û dest bi nivîsîna gelek lîstokên şanoyê ku çavkaniya xwe ji zanabûna civakî digirin, manîfesto û gotaran dike. Ji ber ku jin e û di nivîsên xwe de pergal rexne kiriye, heta sala 1789'an ev nivîs nehatine çapkirin. Dibêje; “Zilam, tu dikarî dadperwer bî? Jinek, ji te vê dipirse. Herî kêm tê vî mafî ji destên wê negire. Bêje, kê hêza zalimane ya

çewisandina zayendê, daye te? Bi vî awayî, hişmendiya zilamê zordest lêpirsîn dike.

Meclîseke netewî ya ji zilaman cuda û tenê ji jinan pêk tê, ava dike. Olympe de Gouges, ji bo mafê dayîkên ku nezewicîne-feqîr, mafê zarokên bêjî û ji bo guhertina saziya zewacê têkoşînê dike. Li gorî wê, zewaca li gorî kevineşopiyan, dibe "gora bawerî û hezkirinê". Ji ber ku Olympe de Gouges, ji aliyê serdema xwe ve baş nehatiye têgihaştin, gotiye; "Dema min nehat." Lê ew bi hizir û ramanên xwe yên angaştdar ve di têkoşîna li hemberî zilam de, meşandiye, bû jina ku ji dema xwe re bersiv afirandiye. Di gotineke xwe de dibêje; "çawa ku mafê darvekirina jinê tê naskirin, divê mafê derketina ser kursiyê jî, were naskirin." Di

MADAME ROLAND (Madam Roland)

Tîrmeha 1793'yan de tê girtin. Di meha mijdara heman salê de bi heybera giyotînê tê kuştin.

Darvekirina Olympe de Gouges, bi gotinên; "xwest bibe miroveke dewletê, ji ber ku wê dilpakiyên ji zayenda wê tên, ji bîr kir, zagonan ew siza kir" tê nirxandin.

Madam de Roland a ku ronakbîreke dema xwe ya navdar e jî, bi awayekî çalak beşdarî Şoreşa Fransayê dibe. Ji bo mafên jinan, têkoşînê dimeşîne. Lê di têkoşîna ku Madam de Roland dimeşîne, bi hinceta; ''Dayîkek bû, lê dema ku xwest derkeve ser xwezaya xwe re ew feda kir. Daxwaza wê ya pirzanînê, rê li ber windakirina wê ya dilpakiya zayenda wê vekir. Vê jibîrkirina her tim bitirsnak, rê vekir ku li sêdara darvekirinê can bide" tê darvekirin. Bi van darvekirinan hewl tê dayîn ku çavên hemû jinan bên tirsandin. Lê ev çewisandin, jinan natirsîne. Jinan di encama têkoşîna xwe de mafên di girtina

MADAME ROLAND

mîrateyê de wekhevî, bi lihevkirina beramber re mafê hevberdanê, di sazî û dezgehên civakî û fermî de mafê şahidî kirinê, bi dest xistin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Raperîna 5'ê Cotmehê ji bo çi ye?

2. Olympe de Gouges, di daxuyaniya xwe de çi ragihandiye?

3. Çima Madam de Roland, tev li şoreşa Fransayê bûye?

4. Jin azad çêbûye û di maf de bi zilam re wekhev e. (Vê hevokê şîrove û nîqaş bikin).

WANE 3

HIZIRÎNA ŞOREŞEKÊ DI ŞÊWAZA JIYANA JINAN DE

MARY WOLLSTONECRAFT

Nivîskara ingilîz Mary Wollstonecraft (Marî Olstonkraft) (1759–1797), xwest xwe di gelek karên weke; mamostetî û dadê de biceribîne. Di dema xebata xwedîkirina zarokan de çîroka bi navê; "Mary" û pirtûka bi navê, "Perwerdeya Zarokên Keç" nivîsand. Di 1792'yan de pirtûka bi navê, **"Parastina Mafê Jinê"** weşand. "Êdî di şêwaza jiyana jinan de dema pêkanîna şoreşekê hatiye.

Ji bo jin rûmeta xwe ya ku winda kirine, bi paş ve werbigirin, weke parçeyeke bingeh a mirovan karibin sûdê bidin, guhertina cîhanê dereng jî maye. Di tevahiya jiyana xwe de ji bo dîtina perwerdeyeke baş, her tim astengî derketine. Ji ber vê yekê, ji bo wê mafê jinan ê wekheviya di perwerdeyê de bûye armanca jiyana wê ya herî mezin.

DANEZANA HESTAN

ELIZABETH CADY STANTON

Jinên li Amerîkayê ji têkoşîna rizgariyê ya reşikan bandor dibin û têkoşîna mafên jinan didin destpêkirin. Di 1842'yan de **"Kongreya Li Dijî Koletiya Cîhanê"** li Londonê civiya. Beşdarbûna jinan a ji bo vê civînê, tê astengkirin. Lucretia Mott (Lokrîtiya Mot) û Elizabeth Cady Stanton (Îlîzabês Kadî Stanton), vedigerin

Amerîkayê û ji bo rizgariya jinan, xwe birêxistin dikin. Stanton, di dîroka (19-20) Tîrmeha 1848'an de Danezana Hestan a ku di Seneca Falls a li New Yorkê de tê weşandin, dinivîse. Ev civîn, yekem civîna mafên jinan e. 100 jin û mêr danezanê îmze dikin.

Vê belgeyê, di Danezana Hestan a li ser Danezana Mafên Serxwebûna Amerîkayê hatibû rûniştandin de wisa digot: **"Dîroka mirovahiyê, dîroka her tim zerardayîna zilam a mafê jinan û destdanîna ser mafên wan e. Jin, heyberên rasterast li ser stembariyeke misoger tên pêkanîn in."** Vê hizirê diyar kiriye ku çewisandina li ser jinê tê pêkanîn, bingeha xwe ji pergala baviksalariyê digire. Di vê belavokê de pirsgirêkên jinan tên vegotin û zagonên wekhevî, perwerde, mafê dengdanê û derfetên karkirinê hatine xwestin. Lê ji bo mafên jinên reşik, tu tiştek di vê belavokê de nehatiye nivîsîn. Di heman salê de li New Yorkê konvansiyona (peymanên navnetewî) jinan dicive. Yekîneyên jinên mafê dengan ên netewî û yekîneyên jinên Amerîkayî yên mafê dengdanê, tên avakirin.



LUCRETIA MOTT

8'Ê AVDARÊ ROJA JINÊN KEDKAR ÊN CÎHANÊ

Di 8'ê Avdara sala 1856'an de li bajarê New Yorkê karkerên ku di kargehên dirûtinê (tekstîlê) de kar dikirin, ji bo mafê karê wekhev, muçeya wekhev û 8 saetan karkirinê, bi 40.000 jinî ve ji bo daxwaza mafan, berxwedanê pêş dixin. Berxwedan, bi tundî tê çewisandin.

Jinên tev li vê çalakiyê dibin, bi saxî tên şewitandin. Di vê bûyerê de 129 jin bi şewitandinê tên kuştin. Di 1909'an de li enternasyonala duyem biryar tê girtin ku 8'ê Avdarê her sal weke Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê bê pîrozkirin.

DÊ KEÇÊN, KEÇÊN ME, BI ME ŞANAZ BIN:

Tevgera Sufrage (Sufrajet)

Di destpêka sedsala 20'an de yek ji raperînên civakî yên girîng, Tevgera Sufrageyê ya ku Îngilîstan û DYE hejandiye. Sufragetên ku ji bo mafê dengdayîna jinan têdikoşin, ev merşa bi nav û deng digotin: "Dê keçên, keçên me, bi me şanaz bin, dê bibêjin baş e ku min kir xwişka-birayê Sufragetê, baş e ku min kir."

Di wê demê de li Brîtanyayê, sê tevgerên bingehîn ên ji bo mafên jinan têdikoşiyan, hebûn.

❋ Tevgera **Sufragetê** di destpêka sedsala 20'an de dest bi têkoşîna xwe dike. Emmeline Pankhurst (Êmîlîn pankîrst Coldin) keçên wê Christabel (Kirstîbal) û Sylvia (Sîlfya) di salên 1903'yan de ji bo mafê dengdayîna jinê Yekîneya Jinên Civakî û Ramyarî ava dikin. Ev, di têkoşîna jinan de pêvajoya zindîbûneke nû dide avakirin. Li Brîtanyayê, li dijî yên ku mafên jinê dixwazin; dijberiyeke dijwar tê meşandin. Li dijî vê rewşê jî, jin çalakiyan li dar dixin.

EMMELINE PANKHURST

Mînak: Di xwepêşandanan de cam şikandin, postexane şewitandin û xwe bi zincîran ve girê dan; şêweyên çalakiyan in. Rêbaza wan, bi çalakiyên sorkirinê û deng vedidin re doz di rojevê de girtin e. Hevdîtin li dar xistin, bi ser civînên partiyan de girtin û serî li tundiyê dan. Dema dihatin girtin, diketin greva

birçîbûnê. Bi awayekî hişk, ji devê wan tûp dixistin hundirê wan û ew wisa tîmar dikirin.

Rêberên weke: Mary Clarke (Marî Kilark), Jean Hewart, Katherine Fry di dema van pêkanînan de jiyana xwe ji dest dane. Di sala 1908'an de 500 hezar kes dimeşin. Di 18'ê Mijdara 1910'an de "Îna Reş" a di dîroka jinê de xwediyê cihekî girîng e, tê jiyîn.

Di wê rojê de rêjîmê zagona ku armanc dikir, mafê dengdayînê bide yek milyon jinên ingilîz ên xwedîsermiyan, pêşkêşî parlementoyê bikira. Lê serokwezîr, di kêliya dawiyê de ji vê vegeriya. 300 jinên têkoşer, li pêşiya parlementoyê dest bi protestoyan kirin. Tirimbêla serokwezîr Herbert Asquith, hat şewitandin, polîsan êrîşî xwepêşanderan kir. Du jin hatin kuştin, 100 jin jî hatin girtin. Jinan malên gelemperiyê şewitandin û xwe bi zincîran ve bi deriyên qesra Buckingham ve girêdan. Bi êrîşkirina ser malên ramyaran, protestoyên xwe domandin.

Têkoşera rêxistina Sufragetê Emily Wilding Davison (Êmîlî Wîldîng Dafîson), ji ber çewisandinên li ser jinan, di sala 1913'yan de çalakiyekê dike. Di pêşbirka hespan de xwe tavêje nava lingên hespê Serwerê Qraltiya Hevgirtî George 5'em û jiyana xwe ji dest dide. Ev rewş, li ser têkoşîna jinê bandoreke mezin dike. Dilsozî û têkiliya gel a ji Tevgera Sufragetê re bi pêş dikeve. Li Birîtanyayê di Avdara 1918'an de jinên xwedîsermiyan ên di ser temenê 30 salî re di 1928'an de jî, hemû jin mafê dengdayîn û hatina hilbijartinê qezenc dikin.

EMILY WILDING DAVISON

Li DYE'yê di sala 1869'an de, bi pêşengiya Elizabeth Cady Stanton Komeleya Neteweyî ya Mafê Dengdana Jinan hat avakirin. Di heman salê de zilam jî beşdarî komeleyeke din a ku ji aliyê **Lucy Stone (Losî Ston)** ve hatiye avakirin, bûn. Di sala 1890'î de her du komele bûn yek. **Alice Paul** a ku perwerdeya xwe ya ramyarî bi tevlîbûna protestoyên têkoşerî yên ku li Brîtanyayê bi pêş ketin dîtiye. Li DYE'yê Partiya Neteweyî ya Jinan damezirand û dest bi serlêdana planên têkoşerî kir. Dema ku Paul û hevalên wê li girtîgehan di greva birçîbûnê de bûn, bi zorê xwarin di difinên wan re didan û wisa ew tîmar û xwedî dikirin.

LUCY STONE

Di Rêbendana (Çileya) 1917'an de **Alice Paul** (Elîs Pol) û hevalên xwe li ber deriyê Qesra Spî, çalakiyeke dîrokî ya bi mehan bidome, dan destpêkirin. Li DYE’yê, di sala 1920'an de mafê dengdayîna jinan, hat pejirandin.



ALICE PAUL

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Pirtûkên ku Mary Wollstonecraft weşandine, çi ne?
2. Di 8'ê Avdara sala 1856'an de kîjan bûyer çêbûye?
3. Yekem civîna mafên jinan, kengî û li ku çêbûye?
4. Tevgera Sufraget, binirxîne.
5. Li Brîtanyayê, jinan çawa çalakiyên xwe li dar xistin?
6. Emily Davison, bi çi awayî çalakiya xwe li dar xist?
7. Komeleyên ku li DYE'yê hatine avakirin, bi pêşengiya kê bûn?
8. Alice Paul, kî ye?

WANE 4

SERÎRAKIRINA MÊTINGEHA HERÎ KEVIN

Berfirehtir nirxandina femînîzmê mijarên waneyên me yên jineolojiyê ne. Em ê di vê waneya xwe de pênase û taybetiyên bingehîn ên femînîzmê bigirin dest. Têgîna "femîna" a bi zimanê latînî û weke pêveka wê têgîna bi zimanê fransî "femînîzme" ji têgîna femînîzmê tên û cara yekê ji aliyê fîlosofê civaknas Charles Fourier ve (1772–1837) hatiye gotin. Tiştê Fourier diparast ew bû ku pêşketina civakî, bêtir bi dayîna mafên azadiya jinê re dikare pêk were. Fourier, di 1808'an de gotiye; "Rêbaza bingehîn a pêşveçûna civakî, berfirehkirina mafên jinan e."

Di sala 1892'yan de yekem Kongreya Jinan a Navneteweyî, li Parîsê hat lidarxistin û di vê kongreyê de peyva femînîzmê weke raveya teoriya parastina mafên jinan, hat ecibandin. Ev peyv, bi demê re hat pergalîkirin, lê negihaşt pênaseyek tenê ya femînîzmê.

ÎRO JÎ, NAVEROKA TÊGÎNA FEMÎNÎZMÊ, RASTÎ GELEK PÊNASEYÊN CUDA TÊ

1. Tevgera berfirehkirina rist û mafên jinê yên di nava civakê de ye.
2. Tevgereke ramyarî ya têkiliyên desthilatdariyê yên di navbera jin û zilam de armanc dike ku biguhere.
3. Tevgereke hizirî ya ku dixwaze jin, ne bi çavên zilam; bi çavên xwe karibe li cîhanê binêre.
4. Bîrdoziyeke ku pirsgirêkên jinan ên tenê ji ber jinbûna xwe dijîn, lêkolîn dike. Dixwaze hiyerarşiya di navbera zayendan de rabe û rizgariya jinan dike armanc.
5. Awayekî zanabûna rexnegir e.

6. Li hemberî çewisandin û bindestiya zayendî, kolekirin û jiholêrakirina bîrdoziyên serwer ên di astên cuda de, ketine nava çanda Rojava, şerek tê meşandin.
7. **Pênaseya tevgera femînîstê:** Jin, ne têgîneke xwerû (homojen) a ku bi tena serê xwe bê destgirtin e. Bi diyardeyên weke; ol, reng, nijad, civak û çînayetî re pêş dikeve. Ji ber vê sedemê, femînîzm tenê bi yek hizirê ve nikare bê aşkerekirin. Femînîzmên cuda û tevgerên femînîst ên cuda hene. Lê di her rewşê de femînîzm, şerekî aştiyê yê ku cudahiya jinê destnîşan dike. Tevgerekê armanc dike, têkiliya bindest û serdest ji holê radike.

Li gel van xalan û pênaseyên xwe yên cuda, tevgereke femînîst a pir parçe ye.

Tevgera feminist, gelek berxwedanên jinan ên di sedsala dawiyê de çêbûne, di bin navê femînîzmê de kom dike û dabeş dike. Weke; pêla yekem, duyem û sêyem pênase dike. Bi navên cuda bi bîr tîne. Dibe ku bi armanca têgihaştina hinek hişmendî û xweseriyên hatine guhertin ên ku mora xwe li tevgera jinê dabin. Lê dîsa jî, ev kategorî û navlêkirin, ne rast in, çêkirine. Ne li gorî felsefeya rast a dîrokê ne. Em fêr bûbûn ku dîrok pêvajoyeke bênavber e. Dîroka koletî û azadiya jinê

jî, pêvajoyeke wiha ye. Tevger û tevgerên femînîst jî, di nava vê pêvajoyê de têgihaştin û pênasekirin, girîng e. Lê ji bo ku em karibin têbigihêjin û wateyê bidin wê, divê em hinek navlêkirinên femînîst zanibin. Femînîzma lîberal, femînîzma sosyalîst, femînîzma radîkal, femînîzma hebûnperest, femînîzma anarko, eko femînîzm, nêzîkatiya psîkanalîz, pro femînîzm û hwd. Hin ji van navlêkirinan, bêyî destûra jinên ku têdikoşin hebe, ji aliyê femînîstên Rojavayî ve lê hatine kirin.

Mînak: Bi taybetî hin tevgerên femînîst ên li Tirkiyeyê, ji bo Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê dibêjin, femînîzma etnîkî. Lê Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê, xwe bi vî awayî nav nake. An jî, ji tevgerên jinan ên bi kesayeta îslamî pêş dikevin re dibêjin, femînîzma îslamî. Lê ew xwe wiha bi nav nakin. Ji vî alî ve bi zanabûna dîrokî ya rast ve xwendina me ya femînîzmê û navlêkirinên wê girîng e.

Femînîzmê kîjan navên cuda girtibe bila girtibe, bi taybetî, di (30-40) salan de daneheveke girîng a bîrdozî, teorî û zanistî afirandiye. Di şiyarkirin û bilindkirina zanabûna jinê de bûye xwediya kedeke mezin. Di rastpênasekirina nasname û hebûna jinê û ronîkirina dîroka jinê de bingehên bihêz ava kiriye. Bi taybetî, pêvajoyên, di rexnekirina raman, hizir û saziyên serdestiya zilam de, demên diyarker bûn. Femînîzm, ji destpêka sedsala 20'an ve bû sedem ku pirsgirêka azadiya jinê bê dîtin. Di lêgerîna bûyîna vebijark (alternatîf) a ji zanistên civakî yên hene re bû hêzeke rexnegir. Di xistina rojevê ya pirsgirêkên ekolojî û demokrasiyê de, têkoşînker bû. Tevgerên feminist, di sedsala 20'an de bûn enerjiya dayîkên xwedawend a berxwedêr, herikbar û azadiyê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Nêrîna Charles Fourier a li ser jinê, çi ye?

2. Bûyera ku di sala 1892'yan de çêbûye, lêkolîn bikin.

3. Navlêkirinên li femînîzmê hatine kirin, çi ne?

FERHENGOK

PEYV	ŞÎROVEKIRIN
Ajîte	Lêsorkirin, teşwîq
Asî	Serhildêr, kes an jî koma ku li dijî tiştekî derdikeve.
Axur	Xaniyên ku lawirên kedî tê de tên xwedîkirin.
Bihane	Hêncet, sûncên nerast
Çors	Ew kesê ku bi gotin yan jî kiryarên xwe mirovên din aciz dikin, ew kesê bê niyet dibe sedem ku yên dora wê/wî şerm bikin.
Dadnasî	Hiqûq
Dadperwer	Kesa/ê bêdadiyê nake û naxwaze ku bêdadî li mirovan bibe.
Danezan	Daxuyanî, ragihandin; peyama ku tê belavkirin da ku mirov jê agahdar bibin.
Derbirîn	Ravekirin, diyarkirina hest an jî helwestan.
Derhoz	Mucîze, tiştên ku çêbûna wan ecêb tê dîtin.
Diyarde	Bûyera yan taybetiya ku dubare dibe yan jî tê dubarekirin.
Dîzik	Beroşa ku ji axê hatiye çêkirin, da ku xwarinê têde çêbikin.
Etnîsîte	Koma nijadan, heman nijad.
Feraset	Hişmendî, tiştê ku mirov ji ol yan baweriyên derdora xwe digire û weke tevgera xwe dide pênasekirin.

Haşatîkirin	Derazberdin, ne rastkirina gotinan.
Lasayî	Çavlêkirin, mîna kesekî yan jî tiştekî kirin.
Lebatî	Çalak, tişta/ê, kesa/ê pir dixebite.
Lûtke	Bilintirîn beşa cihekî, yan tiştekî mînak: lûtkeya darê.
Mezaxtin	Serfkirin, dayîna pereyên pir ji bo kirîna tiştekî.
Misoger	Ekîd, tiştê ku em ji serketina wê bawer in.
Muçe	Meaş, pereyên ku ji bo karekî tên dayîn, heyvane.
Perestgeh	Cihê perestinê ango îbadetkirinê mîna: mizgeft, dêr û hwd.
Protesto	Xwe li dijî kesek, an jî tiştekî nerazîkirin. Şermezarkirina kesek, an jî tiştekî.
Raçandin	Rêsîn yan jî hûnandin.
Radîkal	Serhişk, kesa/ê ku tenê rêbazê xwe dipejirîne.
Razdar	Mîstîk, bisirr.
Rikeh	Qefes; dera ku lawir bitaybet çûk tê de têne dîlgirtin.
Rûpoş	mask, berrû, rûyîn, girtek
Sêwirandin	Vegotin.
Xenîmet	Tiştên ku di şeran de tên standin.
Xilik	Kevirên biçûk ên weke nokan.

BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

Heftî / Heyv	Heftiya Yekem	Heftiya Duyem	Heftiya Sêyem	Heftiya Çarem
Rezber			Pêwîstiya fêrbûna dîroka jinê	Civaka xwezayî
Cotmeh	Jiyana civakî	Afirînerên şoreşa neolîtîkê	Di neolîtîkê de aborî, rêveberî û avaniya hişmendiyê	Di neolîtîkê de zanist
Mijdar	Şoreşa neolîtîkê û xwedawenda dayîk	Nasnameya jinê ya xwezaya civakî: xwedawendî	Parêzvana ûrûkê: înanna	Ji deryaya xwedawendan çend xwedawendên din
Berfanbar	Serwerbûna hişmendiya zilam desthilatdar	Windakirina xwedawendan	Xwedawendên berhemên hizirê mêr	Reşkirina jinê ya bi riya olên yekxwedayî
Rêbendan	Pêşbirka biçûkxistina nasnameya jinê	NIRXANDIN	BÊHINVEDAN	BÊHINVEDAN
Reşemeh	Li beramberî şikandina zayendî damarên berxwedêr- 1	Li beramberî şikandina zayendî damarên berxwedêr- 1	Li beramberî şikandina zayendî damarên berxwedêr-2	Li beramberî şikandina zayendî damarên berxwedêr- 2
Avdar	Kûrbûna koletiya jinê	Jin û namûs	Nasnameya jinê ya aqilê zilam	Rêgeza enerjiya azadiyê ya herikbar
Cotan	Şoreşên jinê	Şoreşa fransa	Şoreşa fransa	Di şêwaza jiyana jinan de hizirîna şoreşekê
Gulan	Serîrakirina mêtingeha herî kevin	NIRXANDIN		